

Seroka Giştî ya NÇM'ê Nuray Şen

B

êyî îstis-
na

temamî xebatkarên me xistine binçav, di îşkenceyê re derbas kirine. Şevên ku em tê de beşdar bin, dawetên ku komên me tê de hebin, tên qedexekirin, berhemên me tên berhevkirin û di heqê me de li dadgehan doz tene vekirin. Walîtiya Stenbolê, ji gelek cih û salonên dewetan re talîmat rê kiriye ku komên me dernexin.

Di binçav de ji min têkiliya saziyê û PKK'ê dixwestin û digotin: "Hûn li wir li ser navê PKK'ê xebatê dikin, xortan perwerde dikin û dişînin çiyê. Hûn bi talîmatên PKK'ê xebata xwe didomînin."

Rûpel 8-9



Serê dewletê
bi stranên kurdî re

- ✓ Cîgirê Giştî yê HADEP'ê OSMAN ÖZÇELİK jî tevî nav nivîskarên me bû. Bi navê "Tirs û Fobî" derûniya rêveber û serwerên tirkî şîrove dike. Rûpel 2
- ✓ AMED TÎGRÎS, xetereya ku zargotin û muzîka kurdî tê de ye, eşkere dike û balê dikişîne ser programên MED-TV'yê. Rûpel 7
- ✓ Nivîskarê kurd ê îslamî MEHMET METINER, jî êdî ji me re dinivîsê. Metiner di nivîsa xwe ya "Dîn, kurdî û polîtîka" de rewşa kurdan dinirxîne. Rûpel 13

NAVEROK



Serhildana Şêx Seîd:
"Rapêçana biserneketî"



Seîd Yûsîf:
'Govenda dilan'



Hiqûqnasên kurd
yekîtiya xwe ava dikin

4

10

11

Ji Xwendevanan

LI ser me kurdan asîmilasyonêke pir mezin heye. Dewlet, me ji çand û zimanê me dûr dixê. Ev jî ne bes e, îcar em jî aliyê dewletê dikin. Zimanê dê, cihê xwe hiştiye ji zimanê biyan re. Gerek e em vê şermê li ser xwe rakin. Çawa:

- 1) Em bi kurdî bifikirin, mijûl bibin, bixwînin û binivîsin.
- 2) Em zimanê xwe bi xwe hîn bibin.
- 3) Agahiyan, ne bi pirtûkên tirkî, erebî û hwd. emê bi pirtûkên kurdî belav bikin.

Em naxwazin dawîya Azadiya Welat ji wekî rojnameyên din be.

EYÛP DEMÎR/ÇEWLIK

MIJARA min li ser bîr û baweriyên bav û kalan e. Gava ku stêrk ji esman dixurici disa digotin ku yek mir. Me fêm kir ku ew stêrên gerok in, gava ku di valahiya esman de digerin, dikevin atmosfera gerdûnê û agir ji wan dipijiqê.

Gava ku çavên wan dijenin dibêjin wê bobelatek bê serê me. Rebeno bobelata mezin hatiye serê te, tu bindestî lê te hay jê nîn e.

Çaxa em ji têkoşînê dipeyivin dibêjine min: "Ma tu dîn bûyî, ma tişteki wilo dibe? Tu ciwan û nezan î." Em ciwanên hişyar, me tişteki fêm kiriye ku em têkoşînê didin. Tika me ji we ye, hûn alîkariya me bikin ne ku hûn ji me re bibin asteng.

REMZÎ QOLHONLI



Hîmê rojnamevaniya kurdî li xerîbiyê hate vedan

MEHMET GEMSİZ

Koçberî, dîrxistin, şaredîrîkirin, xerîbî û her wekî din, her li para me ketine. Rewşenbîr, siyasetvan, hunermend, weşanvanên me her li deverên biyan ji xwe re keys û mecal dîtine ku ji bo gelê xwe tiştinan bikin, ku îro jî ev yek berdewam e.

Gava em bala xwe didin dîroka rojnamevaniya kurdî jî, em vê rewşa kambax dibînin. Belê, rojnameya me ya pêşîn "Kurdistan" li Qahîreya Misrê derket. Di 22'yê avrêla (nîsana) 1898'an de ji aliyê Mîqdât Mîdhed Bedîrxan ve. Ev yek ji berstem û tehdeya sultanên Osmanî bû. Nedihîştin ku kurd çavên xwe vekin. Piştî îlana meşrutiyetê kurdan li Stenbolê jî kovar, rojname derxistin; wekî: Jîn, Kurdistan, Rojî Kurd, Hetewî Kurd. Ez ne şaş bim tev jî ne xwerû bi kurdî bûn û ew bi herfên erebî bûn.

Di pey avakirina Komara Tirk de, kurd dîsa hatin pelçiqandin. Em tev vê demê baş dizanin. Rêber, zana, siyasetvan û pêşewayên kurd ji neçarî derketin der; ji bilî kesên ku hatin girtin û kuştin.

Îcar li Şamê, dîsa Bedîrxaniyan dest avêtin weşanvaniya bi kurdî. Mîr Celadet Bedîrxan kovarek bi navê "Hawar" di 15.5.1932'yan de bi herfên latînî pêşkêşî kurdan kir. Bi wê jî nema, kovarek bi navê "Ronahî" jî di 1.4.1942'yan de êdî bi can kir. Dîsa Bedîrxaniyekî, îcar Dr. Kamûran Alî Bedîrxan li Bêrûdê rojnameyekê hefteyî bi navê "Roja Nû" di sala 1943'yan de derxist.

Em bala xwe bidine van agahiyên li jorê, ku hema me di ser re ew dan, wê xweş bê dîtin ku, ev weşan tev ne li welêt, her li derî welêt derketine. Ji ber vê rewşê em dikarin navê "Rojnamevaniya li surgûnê"

li yekê bikin. Bi taybetî piştî derbeya leşkerî ya tirk a sala 1980'yî, ji bakurê welêt gelek kurdên hişyar, gihîştî û rewşenbîran koçî Ewropayê kirin, nemaze jî Swêdê. Ew kes, li wir netebitîn û dest bi xebatên vejîna berhemên nivîskî yên bi kurdî kirin. Kovar, rojname, bulten, pirtûk û hwd. derxistin. Hin jî wan xwerû bi kurdî û hinên din jî bi kurdî-tirkî. Mîna: Armanc, Berbang, Roja Nû, Kulîlk, Mîrkut, Tîrêj, Çarçira, Berhem, Bergeh, Pale, Qêrîn. Ew li ser siyasetê, çand û hunerê, zarokan bûn; hin jî mîzahî bûn.

Kurdan, rewşa welêt di ser guhên xwe de neavêtin, her çiqas ne li Amedê be jî, di 22.2.1992'yan de li Stenbolê rojnameyekê hefteyî bi navê "Welat" derçû, ku xwerû bi kurdî bû û 115 hejmar derket. Dûajoya wê Welatê Me hat, di 20.11.1994'an de. Ew jî 46 hejmar derket. Lê al li erdê nema. Îcar Azadiya Welat ew al hilda, di 26.1.1996'an de.

Ev her du rojnameyên dawî, ku xwerû bi kurdî bûn, tevî ya me, biyanîti neztikirin welêt kirin û bûn ling û piyên çalakî û xebatên li derve û ew anîn li Stenbolê danîn. Îro rojnameya ku xwerû bu kurdî derdikeve, Azadiya Welat e.

Tîrs û fobî

Îro pêwistiya neviyên selçûkiyan û kurên M. Kemal ji psîkanalîstan re heye. Ji ber ku ew bi nexweşiya tîrsê ketine.. Tîrsa wan êdî bûye fobî. Fobiya ku, ji wan kirî her kes dijminê wan in.

OSMAN ÖZÇELİK

yan û miriyên bi kefen tîrb diqelaştin û radibûn ser lingan... Dest diricifin û bi kurtekurta dil, sing dihate kutan. Û paşê, lingino heyran, bi çargavan bi şûn de dihate vegerîn. Tîrsa zarokan a ji mezelan wilo dihate şikandin.

Dibêjin rojekê xortek bi vî awayî diçe nava mezela ku sing bikute. Ji tirsan dixwaze bi lez û bez karê xwe bi dawî bîne û vegere. Kirasekî dirêj li xwe kiriye û dawa kirê di tariyê de ketiye ber wî û fireh belav bûye. Sing, di ser dawa xwe de dikute erdê. Gava ku dixwaze rabe, kirasê wî bi wî re nayê. Dibêje qey miriyan bi kirasê wî girtiye û wî bernadin. Çiqas hewl dide xwe ku kiras ji destê mirî xelas bike, bêfeyde ye. Ji tirsan, dilê wî disekine û dikeve dimire.. Ku tîrs di dilê mirov de mezin bibe, dikare mirov bikuje.

Sigmund Freud û şagirtên wî li ser zanistiya psîkanalîzmê xebitîne û gelek bi pêş ve birine. Bi kurtayî psîkanalîz rêbaza saxkirina ruhî ye. Psîkanalîst jî, ji bo nexweşan alîkariya bîranîna travmayên biçûkayî ku hatine dewisandin dikin.

Îro pêwistiya neviyên selçûkiyan û kurên M. Kemal ji psîkanalîstan re heye. Ji ber ku ew bi nexweşiya tîrsê ke-

tine. Di nava tîrsek bêdawî de ne. Tîrs wan, ji tîrsê derbas kiriye, êdî bûye fobî. Fobiya ku, ji wan kirî her kes dijminê wan in. Cîranên nêzik; yewna bulgar, ûris, ereb, cîranên dûr; alman, îngilîz, fransîz, çîn û heya reşikên afrikayê yên reben, herkes dijminên tîrsan niyan in. Û li gorî wan dijminên he mezin jî di nava wan de ne. Ew ermenî, suryanî ne. Dijminên meztirîn kurd in.

Li rûyê erdê her kes û her neteweyekê xwe bi dostên xwe tine. Dixwazin dijminên xwe kêr, dostên xwe pîr bikin. Belê neviyên selçûkiyan wisa ne. Dostan li xwe dikin dijmin, tîrsa dijmin li nava gel belav dikin. Ew bi nexweşiyeke ji fobiyê diwartir ketine.

Wan bi sedsalan, li ser gelek neteweyan zilm û zordarî kirin. Ji serê sedsala 18'an de heta dawîya sedsala 19'an neteweyên di bin dagirkeriyê wan de, yek bi yek serî hildan û yek bi yek azadiya xwe bi dest xistin. Di wê salan de bi vî nexweşiyê ketin. Her neteweyek digihîşt serxwebûna xwe wan jî digotin êdî dor hate ser kîjan neteweyî.


Îro em dikevin sedsala 21'an. Ewê jî ditirsîn ku tişteki ji dest wan herke.

Psîkanalîstên nûjen li ser saxkirina tîrsê bûne du bend. Giyanzanên Agadîrî (Bilişsel ruhbilimciler) dixebitî ku nexweşên wan, ramanên xwe yên ser tiştên ku jê ditirsîn, biguherînin.

Giyanzanên Tevgerî (Davranş ruhbilimciler) jî, nexweşên xwe yî tîrsê, an hêdî hêdî, an jî ji nişka ve tîrsê hemberî tiştên ku ew jê ditirsîn. Wê kurdên ku zarokan dişînin nava mezelan. Gelo hûn dibêjin ewê çawa sê bibin?



ROJA 26'ê reşemiyê NÇM'ya şaxa Edeneyê ji hêla polisên si-vîl ve hate dagîrkirin. Wan dest danîn ser 70 kasetên Koma Azad. Her wiha materyalên din jî dest danîn ser. Polîsan Berpirsiyarê NÇM'ê Hasan Kaya û Rêveber Gulcan Kurnaz jî bi xwe re dibin. Li Gulcihan Alpanê jî îşkence dikin û wê bi mirinê tehdît dikin. Roja 27'ê reşemiyê Hesên Kaya û Gulcan Kurnaz derxistin dadgehê û ew hatin berdan. Hasan Kaya dide zanîn ku ew 30 saetî di bin-çav de mane û ew hatine tehdîtandin. NÇM'ya Edeneyê, heta îro bi dehan car bûye hedefa êrişan. Deriyê Salona Teatra Yekbûn ro-ja 28'ê adara 1995'an hatibû morkirin û ew hê jî venebûye.



ISHAK TEPE roja 24'ê reşemiyê ji bo ziyareta girtiyan ku çû-bû Girtîgeha Bartîn'ê, ji aliyê cendirmeyên Bartîn'ê ve hate binçav-kin. Dewlet sedemên girtina Tepe, li qanûna T.C'ê ya cezayê 169'an ku der heqê wî de qerarê girtinê hatiye dayîn, da nîşan. Her wiha roja 26'ê reşemiyê jî birine Bîlîsê. Wekî ku tê zanîn Is-hak Tepe bavê Ferhat Tepe ye, ku nûçevanê rojnemeya Özgür Gündem'ê bû û ji aliyê mirovên dewletê ve hate revandin, pişt re jî hate kuştin. Berî niha bi demekê biraziyê Ishak Tepe, Sayfettîn Tepe jî, ku nûçevanê rojnemeya Yeni Politika'yê bû, di sala çûyî-dî bin çav de bi îşkenceyê hatibû kuştin.

NÛÇE

DIK Rewş

Îro 65 roj in ku hîlbijarti-na bi giştî li Tirkîyeyê ha-tiye çêkirin. Lê hê jî hikû-metek nehatiye avakirin. Ji ber ku di vê hîlbijartinê de Partiya Refahê (RP) serkefti-nekê bi dest xist, dewleta tirk li hev geriya. Hin kes dibêjin, "Divê ji Refahê re destûr qet neyê dayîn." Ên din jî dibêjin, "Emê wan bi-girin nava xwe û wan mas (bihelînin) bikin. Hinek jî li gorî demê difikirin. Lê belê, ew birastî tiştêkî nafikirin. Ji ber ku bêpolîtîkatî jî, polîtî-kayek e. Tê zanîn ku tiştên xerabtir zêdetir li ser vê dîtî-nê dirisin (şin dibin) û bi des-tê kes an hêzên xerab jî tîn bikaranîn.

Refê bêpolîtîka, refeke bêetîk (bêsinç) e. Karektera meclîsê bi vî rengî ye. Hemû siyasethanên tirk di axaftinên xwe de, hîlbijartin mîna der-manê her problemî didan nî-şan. Gel jî baweriya xwe pê anî. Di wir de jî hate dîtin ku, gel jî bêpolîtîka ye. Ne gel dixwaze vê rewşê bigu-hêre, ne jî wekilên (!) wî.

Divê, hatina Refahê jî bi vî çavî bê nîrxandin. Partiya Refahê, ne li derveyî sîstemê ye. Lê derdorên kemalist baw-eriya xwe bi vê yekê nayi-nin. Bawerî ew e ku, Refah siwana hêzên fundamenta-list e. Dema ku Serokê Refa-hê yê Giştî Necmettin Erba-kan gef xwar, MGK'ê ferman da partiyên din ku bi wê re mijûl bibin û lê dûv re, bi hi-nek hincetan, tekilî dane qutkirin. Niha rewş nîşan di-de ku hikûmet dîsa bi destê MGK'ê tê avakirin. Gelê me divê bizane ku di dîroka komara Tirkîyeyê de her tim nijadperest, şerxwaz û xwînmij li ser kar in. Ev xire-cir giş ji bo xapandina gelên kedkar e, pergala mêtin-kariyê hê jî didome.

DÜZGÜN DENİZ

Çeka kirêt a di destê zordaran de: 'Tecawiz'

Li gorî pirtûkeke Weqfa Mafên Mirovan (IHV) ku li ser bînpêkirina mafên mirovan hatiye amadekirin, di sala 1990'î de 8, di sala 1991'î de 9, di sala 1992'yan de 24, di sala 1993'yan de 22 û di sala 1994'an de 36 kesî ew cure îşkence dîtiye.

Li gorî hinekan îşkence bi tenê karê mirovînen sadîst e. Heke wisa be, hêzên ewleyî yên dew-leta tirk tev sadîst in. Li gorî hejmarên ku Komeleya Mafên Mirovan (IHD) dane, bi tenê di sala 1995'an de li 1349 kesî îşkence hatiye kirin.

Hin kes jî şîroveyeke bi rengî, ji bo ra-vekirina sedema îşkenceyê bes nabînin. Tê gotin ku îşkence ji aliyê kes û hêzên ku rêveberên pergaleke nerawe (nemeşrû) ve, wekî çekekê tê bikaranîn. Her wiha ew kes, ji bo xurtkirina bandora îşkence-yê, çî pêwîst be, dikin. Dîsa li gorî hinek çavkaniyan, kesên ku îşkenceyê dikin di karê xwe de pîspor in û perwerdehiyeke taybet dibînin.

Armanca kirina îşkenceyê, wekî şikê-nandina vîna mirovan tê ravekirin. Lewre jî, tê gotin ku bi qasî îşkenceya fizîkî, ya psîkolojîk jî heye. Nemaze, dema kesên ku îşkence lê tê kirin jin be, Tecawiz tê rojevê. Parêzerê kesên ku li Emniyeta Manîsayê li wan îşkence hatine kirin Er-can Demir, li ser vê yekê dibêje: "Arman-ca Tecawizê hênciqandina kesayetiye ye. Ew cure îşkence, ji bilî jandayînê, bando-reke xerab li ser derûniya mirovan dihele. Bi zanatî û bi pîsporî tê kirin. Bi vî awayî dixwazin hîmê kesayetiya mirovan birû-

xînin û wan ji bo sîstemê bikin însanên bêzerar." Dîsa di rapo-reke Rêxistina Efiyê ya Navne-teweyî de ku di reşemîya 1994'an de hatiye amadekirin, xwendekareke Lîseyê Koca Si-nan a Stenbolê ku li Qereqola Bahçelievlerê lê îşkence bûye, li ser Tecawizê wiha dibêje: "... Jana wê dida paniya min, lê ji aliyê derûnî ve diwartir bû... Min xwe diguwaşt, lê min xera-bûna psîkolojiya xwe nedida der. Ji ber ku heke wan fêhm bi-kira ku bandorê li min dike, wê zêdetir bi ser min de bihatana."

Lêkolînên rêxistinên mafên mirovan nîşan didin ku, hêzên dewleta tirk her sal ji sala berî wê, zêdetir ve cureya îşkenceyê li mirovan dikin. Li gorî pirtûkeke Weq-fa Mafên Mirovan (IHV) ku li ser bînpê-kirina mafên mirovan hatiye amadekirin, di sala 1990'î de 8, di sala 1991'î de 9, di sala 1992'yan de 24, di sala 1993'yan de 22 û di sala 1994'an de 36 kesî ew cure îş-kence dîtiye.

Her çiqas der barê sala 1995'an de tu reqem bi dest neketibin jî, zêdebûna hej-mara kesên ku lê îşkence hatiye kirin, di-yar dike ku hejmara mirovên ku Tecawiz lê hatiye kirin, ji sala berî wê gelekî zêde-tir in. Di sala 1995'an de li Emniyeta En-qereyê, dîleke PKK'yî rastî wê kirinê hat. Ev bûyer demeke dirêj ji aliyê raya giştî ve hate nîqaşkirin. Lê mixabin tevî hemû hewldanên derdorên demokratîk û mal-bata wê keçikê, der barê berpirsên wê ki-rinê de tu tişt nehate kirin.


Li aliyê din hejmara kirinên bi vî rengî li Kurdistanê ne diyar e. Di şerê kirêt de endamên şerê taybet êdî Tecawizî cende-kan jî dikin. Pîrî caran însanên me nikarin dengê xwe bigihîmin raya giştî jî. Wek mî-nak: Li gorî agahiyên ku me bi dest xisti-



ne, li gundekî Sasona Êlihê, ku bi pirani-ya gundiyan cerdevan in, keça malbateke ku ne cerdevan in, par ji aliyê 3 cerdeva-nan ve tê tecawizkirin. Lê ji ber tehdîtan ew nikare giliya cerdevanan bike. Keçik ji wan kesan hemîle dimîne û zarokek jê re çêdibe. Paşê dema giliyê dike, dozger gu-hê xwe nade gotinên wê. Niha ew li Sten-bolê li mala meta xwe diji û ji ber endî-şeya ku wê tiştêk were serê malbata wê, newêre serî li saziyên demokratîk bide û der barê cerdevanan de dozê bide vekirin.

Destpêka sala 1996'an bû mîjûya dengvedana îşkenceya ku li 13 xort û ciwanên Manîsayî hate kirin. Roja 8'ê reşemiyê li Emniyeta Manîsayê 13 xwen-dekar tîn girtin û li wan îşkence tê kirin. Di nav metodên îşkenceyê de tecawiz jî heye. Paşê Yeliz Kılıç, ji nav wan tê der-xistin û tevî îşkenceyê taybet, bi destê çar polîsan tê tecawizkirin. Ev bûyer jî diyar dike ku, heke raya giştî bédeng bimîne wê reqemên 1996'an ji yê 1995'an gelekî zêdetir bin.

SAMÎ BERBANG





Piştî şikestina şoreşê û dîlketina Şêx Seîd. Ji hêla rastê ve: Şêx Şerîf, Şêx Îsmail, Şêx Seîd, Şêx Ebdulahi xîzîzê mezin Qaso (kesê bi nimroya 100)

Rapêçana biserneketî



HESEN HIŞYAR

Tevî vê, dibe çar hefte ku em ji pirtûka Hesên Hîşyar a bi navê “Dîtin û Bîrhatinên Min”, rêzenivîsa li ser Serhildana Şêx Seîd diweşînin û em bi vê hejmarê dawî lê tînin. Bi ya me, hîna jî ew serhildan germiya xwe diparêze û xalên wê yên ku baş nehatine ronîkirin hene. Em xwediyê wê baweriyê ne ku bi vê rêzenivîsê me derî ji hin nîqteyan re vekirine.

Piştî wê perkendebûna leşker, ji Komîteya Merkezî ya şoreşê re bû daxwaz ku Diyarbekir bigirin, hingê di başûr de wê bigihîjin sînorek diwêlî yanê Sûrî ku Fransa lê mandater bû, wê dewleta kurd bidin îlankirin. Bi wê daxwazê bi hêzdariyeke giran em ji çîyan daketin, dor bajarê Amedê ku hawîdor deşteke rast e, di rojhilatê bajar de Royê Dîcle-yê derbas dibe, di bilindahiya rojava de bajar di nav bedeneke wekî Seda Çînê de pêçandî, ji çar deriyan pê ve rê nêre hundir, ji ber topên ser keleşan, hundirê ku bi hev re enda xet dikirin, me deh kilometre dûr bajar da pêçandin. Li wir du enî hatin vekirin her wekî:

1. Eniya Rojavayê Dîcle-yê, di bin fermandeya Emerê Faro û hin kumandanên wekî wî de 10 hezar şoreşger hebûn.

2. Eniya Rojhilatê Dîcle-yê, zêdeyî 10 hezar şoreşger di bin fermandeya Heqî Begê Lîcî û hin kumandanên dîtir

de hebûn.

Nêzikî 40 rojî ew bajar welê ma pêçandî, ji ber wan 50 topên ser keleşê kesek nekaribû bi rojê nêzikî li bajar bike. Çawa ku kesek nekaribû ji Diyarbekirê jî bi derkeve, lê nîzanim çima hingê em daneketin Mêrdîn û Ruhayê da ku em bigihîne dewleteke wekî Fransa belkî pê re peymaneke kirîna sîleh çekirana û riya trenê jî dikete bin sîdariya me. Tirk nikaribûn di wê xeta trenê de Qolordûya Nehan bigihandana Eniya Diyarbekirê, bêtî ku wê bervaniya cengdarî û siyasî bînin bîra xwe, tenê ji me re girtina Diyarbekirê bûbûn daxwazeke yekemîn. Di Komîteya Merkezî de hinan gotin:

—Diyarbekir ji ber ku bi bedenên dijwar tê girtin.

Umer Kurê As, ew çend li dorê ma nikaribû vegire, hingê Emerê Faro, ew Umer Kurê As bûn, “Lê ez jî Emer kurê Faro me, heya destê xwe li serê wan leşkerên vir negirînim em derbasî de-

rek dî nabin. Em diherin ba begên Hezro û Siwêrekê dibêjin: “Heyanî ku hûn Diyarbekirê venegirin em nakevin şer”

Di êvara 8’ê adara 1925’an de her du eniyên rojhilat û rojavayê Dîcle-yê bi hev re bêfeneke siyasî û leşkerî, firqa me ya hendesî da ku di bedenê de hin riyan bide vekirin, em kişiyane dor bedenê; ku ew êrîşa me bi şev saet di heftan de bû. Lewre ji ber wan topên ser keleşê, bi roj em nikaribûn nêzikê bajêr bibin, di dest me de heft topên wê Firqa (Hênê hebûn, me xwest ku bi wan topên xwe bedenên bajêr gulebaran bikin, ew jî Şêx Seîd nehişt û got: “Ma em di bajêr de jin û zarokên xwe bikujin.”

Her wekî agah e, ava vexwarinê ya bajêr ji derve derbasî hundirê bedenê dibe, me xwest ku avê ji ser bajêr bibirin, da ku xwe teslîm bikin. Dîsa Şêx Seîd qebûl nekir.

Her çar deriyên bedenê jî girtî, hawîdor çeperên ser bendenê jî tije leşker

bûn, ji tufeng û mitralyozan pê ve, da ma em nêzikê bedenê an deriyan dibûn ji jor de qumbere (bombe) li me dibarandin, em li Deriyê Çiyê bûn, bi awayî me rê nedî ku em bikevin bajêr cihê ku me çeper lê girtî, tevde kevin reş, li ber guleyên topan parçeyên kevin ran zêde diwarî digihandin me. Birişdar û kuştî ji me çê dibûn, ji bo xuyakirina me, bi dehan ronavêj diavêtin, ber wê çendê me nêzikî li bedenê kirin.

Em gihane nav goristanan, da ku bi kevin bin guleyên topan, di wê nêzikî yê de şer zêde germ bû, lê mexabin bi amnc, bêtî ku kesek ji me xuya be, çawa ku wan jî bêamenc li dengên tufanê gên me berdidan, tenê me berî çeperên ser bedenê û ronahiya agirê devê topan didan. Em li pişt kevirên mezelan, li e dê ramedanî û baranek hûr jî dibariy. Sofiyek li piyan di nav wan gulehên wekî baranê de, digeriya, hate raserî ji sekinî û got:

—Gelî birayan guleyên xwe berî bedenê medin, berî birîskên devê topan bidin.

Ew li piyan her wekî ew gule lib wî kelmêş bûn, ew bi wan nedihak kuştin. Çawa ku di zimanê kurdî xort ji xurtî hatiye, belê xortanî çawa ku bi her awayî hêzdar e wiha diilger e jî, li nav wan mezelan di bin baran sernayê de gule jî wekî baranê dibarayan, ez di xew re çûbûm, kurê xalkî min Huseynê Babêxî gazî min kir

got:

-Mala te xira nebe, tu di nav van gu-
leyan de razayî?

Ji me hêzên Derê Çiyê pê ve li her
çar deriyan şer bû. Li Derê Mêrdînê
alahiyeke siwariyên tirk ji riya Mêrdînê
ve dihatin diçûne hundir, berî bigihîne
deriyê bedenê li Xana Qereçiyân der-
bas bûn ketin navbera şoreşger û leşke-
rên xwe. Her çiqas gazî dikirin digotin
"Onikincî Alahî" yanê Alahiya danzde-
han, lê leşkerên wan bawer nekirin.
Wan, ji pêş ve û şoreşgeran ji para he-
ya tevde hatin kuştin.

Hêzên Derê Ruhayê, çawa hate go-
tin, ji çar deriyên bedenê pê ve rê nedi-
çûne hundirê bajara Amedê, lê ji bona
ku hin kesen bazirganî dema malê xwe
derbasî hundir bikin bacê (gumrikê)
nedin hikûmetê di deveran de di bede-
nê de qul dabûne vekirin. Lê di herbê
de ew qul girtibûn. Wan hêzên wir, qu-
lek ji wan vekiribûn û 61 peya ketibûn
hundir û ji wan ên wir re gotibûn:

-Xeber bidin hevalan, bila li pey me
bikevine hundir.

Mexabin xeber nedabûn hevalan,
şev nîvî bû, me dengê şerekî giran di
hundirê bajêr de bihîst, me guman kir
ku kurdên hundirê bajêr bi şoreşê ve ra-
bûne, lê di zemanekî ne dirêj de me dît
şer vemirî. Ji Eşîra Emerê Faro, Elo Xîç
hate ba me berî ku bibêje ez jî di nav wî
şerî de û çî hate serê me, got:

-Ew tufengên me êvarê digot ev
bûn ha.

-Ev çî tufengên? Te ji ku anî wî?

-Ma ne ez jî di nav wî şerê hundir de
bûn, em dido tenê jê filitîn ên dîtir tev-
de şehîd ketin û bi awayê jêr dazanîn û
got:

-Me li biniya Deriyê Ruhayê qulek

bedenê vekir. Em bi serekiya şehîdê bi-
lind Mihê Helê (Ji eşîra mala Emerê
Faro bû) em ketin mehla Elî Paşa, li
balkonên xaniyan, pîrekan ji me re difi-
landin.

Melayên mizgefta mehelê derket pê-
şiya me. Şeşagira xwe berda heya cer-
cûr vala kir û hilkişiya ser minarê, wê
nîvê şevê ji bo serfiraziya şoreşê bang
da (Serê sibehê leşkerên tirk ew dan ber
singûyan û kuştin. Em ji wir çûne De-
riyê Mêrdînê, ji pişt wan ve me tufeng
xistin pişt wan topçiyên. Me ew topçî-
yên wê beteriye tevde kuştin, em di

em çûne ser Qerqesûn Camiyê ku en-
bara sîleh bû. Li wir piştî payîndar û
zabitek hate kuştin, ew jî teslîm bûn.
Me ew ji xistin hundir, me payîn da ber
wan jî; Mihê Helê ji me re got: "Geli
birayan, xuya ye kesek li pey me neke-
te bajêr. Niho divê em herin hepisxane-
ya mezin tevay girtiyan berdin û bînin
wê enbara sîleh; wan sîleh bikin û bi
xwe re bigirin ser merkezên leşkerî ku
jê û pê ve ji me re rê nîn e, bi vê rêza-
nê em bazêr vegirin.

Lê sed mexabin, berî ku em bigihîne
hepisxaneyê, li biniya Kaniya Şêran

nebûn ku em negihiyane ber hev, me
hev nas nekir. Dema em gihiyane ber
hev, me dît ku leşkerin wan jî dîtî ku
em şoreşger in, me her du aliyan tufeng
xistin zikên hev, heyanî em her du tenê
xelas bûn. Ew hêj dihatin, ev tufeng jî
min ji ser laşê wan anî û em her du te-
nê xelas bûn, di hewşa Mizgefta Mezin
û di enzelê re dîsa daketin û di wê qule
ketî de, em derketin.

Hikûmeta kemalistî wekî xesaisê
xwe yê mengolî dukanên bajêr vekirin,
talan kirin û dane belavkirin ku xwed-
hegiravî leşkerên Şêx Seîd dukan talan
kirine, tevî ku li erdê zêr li ber wan
rijandibûna jî nikaribûn di wî şerê welê
dest bi dest de rahêjine wan.

Di 1928'an de, ku ez ji hepisxaneyê
Anadolê vegeriyan, li Diyarbekirê Eş-
ref Paşa Yedî Bela li mala xwe ji min re
got: "Wê sibehê delal dan gazîkirin ku
kesek dernekeve. Em sê roj di malên
xwe de girtî man. Paşê gotin werin ber
Xana Hesên Paşa. Em çûn, wan laşên
xwe tevde rakiribûn. Ew 59 laşên me li
erdê, her yek topek caw, hin qalibên
sabûnê û şekir xistibûn berîkên wan.
Me ji hev re got: "Ev ker in an me nezan
dibînin? Sê şev e ku her baran dibare, çekên wan tevde
bûne av. Lê ew topên caw ku xistine ber rextên wan,
piçek baran li wan nehatibû."

Êdî dinya li me bû sibeh, diviyabû
em ji dor bajêr, ji ber hingaftina
guleyên topan dîr bikevin. Belê bê ku
di şerê wê şevê de em havilek bi dest
bixin, em dîsa vegeriyan cihên jê çuyî.
Lê bajar wekî berê ma pêçandî, heya ji
Anadolê Qolordûya Nehan hat.

**Li Diyarbekirê Eşref Paşa Yedî Bela li mala xwe
ji min re got: "Wê sibehê delal dan gazîkirin ku kesek
dernekeve. Em sê roj di malên xwe de girtî man.
Paşê gotin werin ber Xana Hesên Paşa. Em çûn,
wan laşên xwe tevde rakiribûn. Ew 59 laşên me li erdê,
her yek topek caw, hin qalibên sabûnê û şekir xistibûn
berîkên wan. Me ji hev re got: "Ev ker in an me nezan
dibînin? Sê şev e ku her baran dibare, çekên wan tevde
bûne av. Lê ew topên caw ku xistine ber rextên wan,
piçek baran li wan nehatibû."**

Çarşiya Mezin de ber bi bakur ve giya-
ne Senaiyê, ji nişka ve em ketin devê
derî. Her du payîndar ji desthilanîn ke-
tin, me tufengên wan ji wan girtin û em
ketin hewşê. Di odeyên jor de leşker li
xwe xurcilên, me reşek tufeng di şiba-
kan re berda wan û me got:

-Teslîm bibin an na em yekê tenê ji
we nahêlin." Tevde daketin, me ew jî ji
sîleh xistin, tevde kirin odeyekê, derî li
wan dada û payîna xwe da ber wan û

alahiya jendirmeyan li wir li pişt kîsên
axê sîper girtibûn, her çendî me şer kir,
lê bi tu awayî me ew ji wan çeperan ra
nekirin. Dîsa em bi şûn de vegeriyan
Texte Qela, ji wir me berê xwe da De-
riyê Çiyê ku ji we re bidin vekirin. Em
gihiyane ba Xana Hesên Paşa, me dît
ku ji

Deriyê Çiyê ve wekî lehî dagirtî û
ber bi me ve tîn. Me bawer kir ku we
derî vekirîye û hatin, ji ber ku elektrîk

Ji bo bîranîna hevalekî

DILBIXWÎN DARA



Berî ku şehîd bikeve, ev name ji diya
xwe re şand. Piştî ku şehîd ket, ev
name ji me re hişt û niha jî ji bo bîranî-
na wî hevalî, ez vê nameyê ji we re dixwî-
nim. Ne tenê ji we re, ji hemû dayikan re, ji
hemû aşiqan re, ez ji hemû gul û bilbilan re
dixwînim:

Şev tarî bûye, reş e. Şevên reş gelek tiştan
tînin bîra mirov. Dema ku ez zarok bûm, te
ez di hembêza xwe de dihejandim, û te çîro-
ka şevên reş ji min re digot. Niha ew gotina
te tê bîra min, ji bîra min neçûye. Gotinên te
zû zû ji bîra min naçin, ev jî sozeke min bû.

Li aliyekî ewran esman di hembêza xwe
de hilgirtine, li aliyê din jî çiyên insaan di dilê
xwe de parastine. Em ji vir, ji germahiya dilê
wan çiyên ve nameyê dişînin.

Niha hemû stêrk di xew de ne. Tenê ez li
vir hişyar im. Çavên min xewê nabînin,
nikarim rakevim. Her xewek ji min re dibe
mirinek, ez naxwazim bimirim. Ne ku ez ji
mirinê ditirsim, hezkirina min ji jiyane gelekî
mezin e. Ji aşîqekî bêhtir jî, ez ji bo jiyane

dimirim, belkî ev jî qedereke min be.

Min bihîst êdî çavên te nikarin, baştir
bixwînin. Ji te hêvî dikim ku, tu xwendina
nameyê bi giriyê xwe qut nekî, li her derê ve
kêmasiya xwe nişan nede... û serê te bila her
bilind be. Ez naxwazim di çavên te de hêsti-
ran bibînim. Ew dilopên ku ji çavên te
diniqutin, wekî topan di nava dilê min de
diteqin. Her dilopek dibe volkanek.

Eger ku tu dixwazî min bikujî, bigirî û
şînê bigerîne, bila hemû gundî serê ve
beyanê, bi dengê giriyê te re ji nava xewa
kederan hişyar bin û bi te re bigirin... Eger tu
dixwazî dilê min di nava lêvên xwe de bigu-
vêşî, devê xwe têxe kezeba min û min di
nava diranên xwe de bikuje. Tu ji min çî
dixwazî? Ji bo çî tu li kuştina min digirî? Ne
ji bo ku tu min bikujî, min ji bo jiyana xwe
bi bîr bîne, ezê jî wiha ji bo jiyana te xwe
bikujim, lê belê ne bi giriyê te re.. Ji kerema
xwe re negirî. Min di hêstirên xwe de
nefetisîne. Gunehe min çî ye? Ez nikarim li
hemberî nalîn û giriyê te li ber xwe bidim,
sebr û hedara min jî ewqas nîn e ku ez li te
guhdarî bikim.

Tu dikarî nameya di hembêza xwe de
veşêrî û bidî ber dilê xwe.

Bi xwe re bibe, bi xwe re bîne û li ser
hemû gundiyan bigerîne, bila her kes pê bih-
ese ku piştî çend salan min ji te re nameyak
şand. Hemû jinan bicivîne, bila li mala me

hev bibînin, eger tu dikarî ji wan re civînekê
jî çêbike... eger te nikaribû jî, ji kerema xwe
re dilê xwe hêdî hêdî veke, ji nava dil
nameya min derxîne û bi hevalekî min bide
xwendin. Niha rewş ne wekî berê ye, di
gund de, hevalên min gelek in, êdî her kes
dikare bixwîne.

Dema ku ez ji gund derketim, hûn di xew
de bûn. Kesek bi min nehesiya. Lê belê min
çavên birayê xwe yê biçûk ramûsandin, min
lêvên xwe bi dilê te germ kirin û bi çavên tijî
hêvî ez derketim û min derî li xwe hêdî hêdî
girt. Tu caran ez wê rojê ji bîr nakim. Ew
hezkirin, ew evîn, û ew hevaltiya bi we re
hîna ji bîra min neçûye, wê her bîmin. Ezê
wê bîranîne bi xwe re heya şehadetê jî
bibim. Ji ber ku bîranîn her demê zindî ne,
her tişt dimire, lê belê tu caran bîranîn
namirin.

Ez naxwazim serê te bi gotinên giran
biêşînim. Porê te spî bûye. Eniya te qermîçî
ye. Çavên te melûl bûne. Belkî diran jî di
devê te de nema bin. Lê belê dilê te weke
dilê aşîqan e. Gelekî ciwan e, hêvîdar e.
Niha jî, ji kerema xwe re, devê dilê xwe ji
min re veke, ezê piştî ewqas meş, şer, çûn,
hatin; piştî ewqas birçibûn, serma, tîbûn...
ezê di dilê te de rûnim, xwe germ bikim, pişt
re jî, eger te xwest dîsa devê dilê xwe li ser
min bigire, lê belê min neêşîne, ji ber ku
niha ez di dilê te de şehîdek im...

Hilbijartin

û Apê Mûsa

Di hejmara me ya pêşîn de me daxuyandibû ku, emê carinan nivîsên Î. OMERÎ yên li ser Musa Anter biweşînin. Va, em vê hefteyê nivîseke wî ya din jî pêşkêşî we dikin. Tê de hûnê rastî rewşa bazirganên rayan bên ku bi çi şeweyî nêzikî di gelê me didin.

Di sala 1965'an de hilbijartineke giştî ya nûneran (membûsan) li Tirkiyeyê pêk hatibû. Di wê hilbijartinê de Apê Mûsa li herêma Mêrdînê, berendamiya xwe ya serbixwe danîbû. Nema giha ku di partî û rêxistinan de berendamiya xwe deyne; ev jî, çiroka wê pir dûvdirêj e. Gorbihuşt di bîranînên xwe de bi firehî nivîsandiye, yê ku meraq dike dikare wan bixwîne.

Bi kurtasî wî û Partiya Karkerê Tirk (TİP), li ser berendamiyê li hev nekiribûn. Ev bûyer jî derveyî, babeta me ye, em gelekî li ser nasekinin. Lê espriyek tê de heye, min navê bîyî şirovekirinê ez tê biborim.

Wê di TİP'ê de, berendamiya xwe li herêma Amedê danîbûya, lê birêz Tarîk Ziya Ekinci ew vexwendiyê hilbijartina berendamiyê kir, ka gel dê kîjanî ji wan berendam hilbijêre (bi tirkî jê re dibêjin önseçim). Apê Mûsa wiha lê vedigerîne:


—Ez nikarim vê konevaniyê bikim. Çawa ezê ji gelê Amedê re bibêjim: “Dr. Tarîk Ziya ne baş e. Ez jê çêtir im. Tu jî bibêji Mûsa ne baş e dengên xwe bidin min.” Ev konevanî bi min nakeve, dibe kêmasiyek bê ser te jî. Incax ez pesnê te bi qencî bidim. Ku ez bibêjim xortên kurd ên pêşverû ne baş in, wî çaxî ez mala xwe bi destê xwe xerab dikim. Ev rûreşî ji min re ne pêwist e. Bi xatirê we, va ez biçim Mêrdînê berendamiya xwe deynim.

Dema hate Mêrdînê, berendamiya xwe bi awayekî serbixwe danî, ji ber ku şaxê (liqê) TİP'ê li Mêrdînê nîn bû. Çend eşîr û bavikên dijberî hev, li hev anîn. Gelê herêmê zehf hez jê dikir. Ji gel û giregirên herêmê artêşeke bangeşiyê (propagandayê) afirand û me dest bi bangeşiya hilbijartinê kir.

Daxwaziya me giştan ew bû ku, em pir dangan derxin (bicivînin), Apê Mûsa bibe nûner (membûs) û em wî bişînin Enqereyê. Zehfên gundan, riyê wan nîn bûn. Yê ku hebûn jî, riyê wan xerab bûn. Bi jîpan û carinan jî bi peyafî geş û ger dihat kirin. Rewşa gerê pir dijwar bû.

Rojekê em bi hêla Midyadê ve çûn. Em dê biçûna gundekî nas û hevalbend. Berî em bigihîjin gund, li ser rê em gihîştin mirovekî ji wî gundî. Mirov nas bû, barek çilo li ser piştê kera wî, ji nav rez dihat diçû gund. Em sekinîn, me li hal û wextê wî pirsî, cixareyê pêçayî me da destê wî û çeqmaq li ber girt. Cixareya xwe vexist. Apê Mûsa jê re got:

—Heval! Îsal ez berendamê nûnêriya Meclîsa Enqereyê me, hewceyî we û dengên (rayên) we bûme. Jixwe em û hûn,



ji berê ve nas û hevalbendê hev in. Pêwist e hûn gundî gişt dengên xwe bidine min û li heman dem jî li gundên derdora xwe ji min re dangan kom bikin. Bi hêz û bi malên xwe ji min re bixebitin.

Hevalbendê me hilmek li cixareya xwe da; dûxanê di her du qulên bêvila wî re diavêt û got:

—Weleh me dengên xwe dan û çû.

Xalê Musa got:

—Kuro ev tu çi dibêji, çawa we dengên xwe dan. Hê sê roj ji hilbijartinê re divên, we çawa dan û çû?

Gundî:

—Xalê Mûsa, weleh do yek ji Qezê (Qoser) hatibû gund, nik kêfxwe (keya). Navê wî Evdîlqadir bû, dengên gundiyan gişt di zikhev de bi çar Penqinot (wereqe) hesabandin û ew kirin, bir û çû. Ma hûnê biçin gund çi? Bi serê te deng meng li gund nemane. Bi ya min be, biçin li deverên din ji xwe re li dangan bigerin. Tiştê li gund nemaye.

Apê Mûsa bi wê bêhna xwe ya fireh, li me vegeriya û got:

—De werin li vê ecêbê, li vê kesnediyê, dijmin em xistine çi rewşê. Em çawa nezan, xizan û paşvemayî hiştine û hîna jî, ji ser piştê me danakevin.



● 3 adar 1943

Kovara Roja nû li Bêrûdê dest bi weşanê kir. Rojnameyeke siyasî bû û ji aliyê Kamuran Bedirxan ve hate derxistin.

● 4 adar 1193

Serdarê kurd Selaheddîn Eyûbî li şamê wefat kir.

● 4 adarê 1925

Komara Tirkîyeyê di rojên Serhildana Şêx Seîd de, qanûnek bi navê "Sikutkirina Bajarên Rojhilata Tirkîyeyê" derxist. Yanê asimilasyon, zilm û zordariya li ser gelê kurd wê bi vî qanûnê bi awayekî rihet bihata meşandin.

● 4 adar 1991

Alî Erek li Girtîgeha Amedê, di rojiya birçûbûnê, roja 42'yan de ji aliyê leşkeran ve, bi lêdanê hate kuştin. Girtiyên PKK'yî ji bo ku tehde û zilma li ser xwe, bi raya giştî bidine zanîn û rê li ber wan kirinê hêzên leşkerî yên tirk bigirin, dest bi xwebirçîştinê kiribûn.

● 6 adar 1921


Serhildana Qoçgiriye; li herêma Sêwazê kurd ji bo azadiya Kurdistanê li hemberî tirkên serî hildan. Lê, ji ber ku hin serok û eşîrên kurd bi wan re xayîn geriyên, serhildan bi ser neket û kurd têk çûn.

AWIR

Serhildana Qoçgiri bû destpêk nebû dawî

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



Di MED-TV'yê de
muzîk û zargotina
kurdî

Wekî ku tê zanîn, muzîk û govenda kurdî gelekî rengîn û dewlemend e. Em navçe û bajaran li aliyekî bihêlin, hema hema li ser her gundî, heta li ser her bûyer, malbat an jî kesên bi navûdeng stran hene. Govenda kurdan jî wiha ye. Her navçe û bajarekî Kurdistanê govenda wê ya serbixwe û cuda heye, wekî; Qers, Wan, Culemerg, Çewlik, Xarpêt, Mêrdîn, Botan-Badînan, Amed, Ruha, Semsûr, Dîlok, Silêmaniye, Germiyan (herêma Kerkûkê) û hwd.

Mirov dikare bibêje ku stran û govend di nav zargotina (folkora) kurdan de, du beşên herî girîng û bingeşin in. Di nav beşên zargotinê de stran beşê bi deng e. Stran, daxwaz, hêvî û keser, gazî û hewarên gel ên hezar salan tîne zimên. Piraniya stranan encam û berhemên kolektîvîyên dîrokî ne, mirov dikare bibêje stran dîrokeke bi deng û jîndar e. Di deng, awaz û rîtmê wê de, ruh û bêhna kurdayetî ya hezar salan heye û ew, ji nîşkekî derbasî nîşkekî din dibin. Her wiha govend jî, beşek ji zargotina bêdeng e. Ew jî wek stranên kurd daxwaz, hêvî, keser, gazîyan bi rîtm, reqis, jest û mîmîkan berpeşî mirov dikan. Ango govend, jiyanê gel a dîrokî bi hereket, reqs, rîtm, jest û mîmîkan tîne holê. Îro mirov dema li van her du beşên zargotina kurdî dinêre, li pêş wan du tahlûkeyên mezin dibîne. Yek jê, ew e ku dijminên me yên dagirker wekî hemû beşên zargotina me, dest didin ser stran û govendên me, wan didizin û navên xwe li ser wan dixin. Ji stranên kurdî re gotinên tirkî, erebî û farisî dibînin û dikin malê xwe. Govend jî, ji xwe bêzar û ziman e. Bi her cureyên govendên kurdî, derdikevin festîvalan û xwepêşandanên neteweyî û navneteweyî û dibêjin govenda me ye. Bi govenda kurdan xelat û diyariyan digirin. Ev dijmin wiha dike. Armanca dijmin pir vekirî û zelal e. Ya duyem, ji aliyê hunermend, govendgêr û muzîsyenên kurd ve tên kirin. Hem jî li ser navê şoreşgerî, pêşverûti û nûjenîyê tê kirin. Ev tahlûkeyeke mezin e. Çawa? Wiha:

Dengbêj û hunermend hema hema hemû amator in. Gotin û meqamên stranên klasîk diguhêrin û li gorî kêfa dilê xwe gotinên nû ji wan re çêdikin. Xwedêgiravî bi wan gotinan stranên şoreşgerî dibêjin (!) Her wiha bi vî yekê, gotin û meqamên hezar salan ên klasîk tên lewitandin. Hinek dengbêj ku MED-TV ji wan re "hozan" dibêje, xwe baş amade nakin û derdikevin ser şanoyê, pêş kamerayan, şermezar dibin. Car caran zarokên deh salî derdikevin, stranan dibêjin û li bin nav wan, hozan jî dinivîsin. Ya sêyem, termînolojiya muzîka kurdî guhertine. Wek ku gotinên dengbêj, stranbêj, hunermend bîr qedexekirin û di şûna wan hemûyan de gotina "hozan" bi kar tînin. Mafê kê heye ku termînolojiya muzîka kurdî ya hezar salan qedexe bike? Gelo gotina "ozan" çiqas bi kurdî ye? Rewşa govendê jî wekî ya stranan e. Form û rîtmên govenda kurdan hatiye xerabkirin.

Mirov li govenda kîjan bajarî binêre, yek rîtmek heye. Aheng, rîtm, hereket û reqsên rengîn û zengîn rabûne û di şûna wan de, lingên xwe li erdê dixin. Kincên herêmi hatine guhertin. Tevlîheviya reng û formên kincan heye. Komên komeleyên herêmi her êvar di MED-TV'yê de derdikevin. Gelo berpîrê giştî yê tv'yê, programên komeleyên herêmi û MED-TV tevlîhev dike? Gelo di warê weşanê de daxwaz, pîvan û tercîh hene? Ku hene, pîvana wê çi ne? An jî ev meseleya îmkanan e? Ev hemû mijarê programa "ziman û huner" in, lê hezar mixabin ku di vî programê de bi zimanê tirkî, li ser huner û çanda tirkî bêhtir gotûbêj tê kirin. Hem jî bi vekirî dibêjin, "Zimanê hunerê tune ye, înternasyonal e." Ev kamuflaja asimilasyonê û dizîyê ye. Bi soranî bersiva vî gotinê "qiseyê qor" e!

gorî plana serhildanê, wê pêşî ala Kurdistanê li Xozatê bihata daleqandin û bi ser bajarên Kurdistanê mîna Erzîngan, Elezîz û Meletiyê de biçûna. Wê ji Enqereyê azadiya Kurdistanê bixwestana. Serokên hin eşîrên xayîn nehiştin ku ev plan derbasî jiyane bibê. Hikûmeta Enqereyê jî her roj leşker dişande herêma.

Di 13'ê Adara 1921'ê de, li meclîsê tirk qerar hate hildan ku Kumandarê Navendiyê Nurettin Paşa serhildanê bipêçiqîne. Nurettin Paşa, pêşiyê li herêma leşker kom kir û di 3'yê avrêla 1921'ê de daxuyaniyek da ku berê dest li ser mal û milkên kesên ku serhildan amade kirine, bê danîn. Di 11'ê avrêlê de, bi êrişkirina leşkeran a li ser gundan, şer dest pê kir. Leşkeran gund dişewitandin, dest diavêtin namûsa jinan, jin û zarokên kurdan dikuştin. Li hêla din şertên zivistanê pir dijwar bû, berf zêde bû û alîkariya Nûrî Dêrsimî negihîştibû Alî Şêr; ev jî tengasiyeke mezin derdixiste holê ku nikaribûn bê alîkarî şer bikin. Di 24'ê avrêlê de, li Çirayê şerekî mezin çêbû. Tugaya 28'an a hêzên dewletê têk çû. Di 29'ê avrêlê de, ji aliyê Giresûnê ve êrişek çêbû; di vî êrişê de jî kurd têk çûn û şer mehekê dom kir. Di 17'ê pûşperê de Alî Şêr bi 32 hevalên xwe ve teslim bû. Serhildana Qoçgiriye jî bi vî awayî qediya.

M. AGIRÎ



Alî Şêr û Nûrî Dêrsimî Xanîm

Serhildana Qoçgiri, di demên avabûna dewleta tirk a nû de rû da. Ev Eşîra Qoçgiri li 19 navçeyên Sêwazê rûdinişt. Wekî Zara, Hafik, Îmrîali, Suşehîrî, Refahiye, Kemah, Dîwrik, Qangal, Ovacik û hwd. Serokê Eşîrê Alîşan Beg bû. Nêzikî 40 hezar peyayên wî hebûn û herêma Sêwazê di bin destê wî de bû.

Şêrê Cihanê yê Pêşîn qediyabû, kurd jî lê dixebitîn ku li ser welatê xwe bibine hikumran. Mustafa Kemal (Atatürk) jî derketibû Anadolê û riyên xwe bi bajarên Kurdistanê jî xistibû.

Dema ku M. Kemal tî Sêwazê, hîn dibe ku kurdên Sêwazê amadekariya serhildanekê dikan. Bangî serokên eşîrên herêma dike. Ji serokên eşîran bi tenê, Serokê Eşîra Qoçgiri Alîşan Beg çû, bi M. Kemal re rûnişt. M. Kemal Alîşan Begê tayînî Qeymeqamtiya Refahiye û birayê wî Heyder jî tayînî Mudurtiya Îmrîaliyê kir. Bi mebesta ku karibin di nava gel de bi hêsanî rêxistinê pêk bînin, ev tişt qebûl kiribûn.

Komelaya Bilindkirina Kurdistanê li Sêwazê jî ava bûbû. Birayê Alîşan Beg Heyder Beg, kurê Musa Begê Alî Şêr tayînî Serokatîya Komelaya Îmrîaliyê kir. Li Dêrsimî jî xebatên serhildanê ji aliyê Nûrî Dêrsimî ve dihat meşandin. Nûrî Dêrsimî li nehiya Qangalê, Yêlîceyê jî serokên eşîrên Canbegan, Kurmeşan û jî yên din alîkarî xwest û piştgiya wan stand. Ji aliyekî ve wan amadekariya tevgerê dikirin. Di bin serokatîya Alî Şêr de êriş birin ser cebirxaneyên ku ji Giresûnê dianîn. Li hêla din dewleta tirk, ji aliyekî ve leşker dişande herêma û ji aliyekî ve jî li riyên hevrûniştinê digeriya.

Di bin serokatîya Mîralay Halit de, Alaya Siwariyan a 6'an di 14'ê reşemîya 1921'an de xwe gihandibû Îmrîaliyê. Ev yek jî, pir hêrsa serokên eşîran anîbû.

Bavê Nûrî Dêrsimî İbrahim Efendî, ji dewletê re notayek dişîne û dixwaze ku leşker bi paş ve vegerin, girtiyên kurd bêne berdan, cihên ku kurd lê pir in, memûr ji kurdan bêne bicihkirin. Selehiyeta bajarên Kurdistanê bidine kurdan. Lê dewlet bi hin eşîrên kurdan ewle bû û bersiva vî notayê neda û bi zêdehî leşker kişande herêma.

Di nava serokê eşîran de civînek çêbû, bi mebesta destpêkirina şoreşê. Hin serokên eşîran wekî Diyar Axa, Maço Axa, kurê Kongo Axa Ahmet Remzî tevî şoreşê nebûn û ji bo mebestiya Dêrsimî çûne Enqereyê. Li



NURAY ŞEN

Ez bi eslê xwe ji Diyarbekirê me, lê jiyan min zêdetir li Ruhayê derbas bûye û zîlamê min jî ji Ruhayê bû; ez 45 salî me û dayika sê zarokan im, ez mamoste me, min demekê nûneriya sendîkaya Egit-senê jî kiriye. Roja 26'ê adara sala 1995'an li bajarê Entabê (Dilûk) zîlamê min ji aliyê kontr-gerîla ve hate revandin, pişt re jî şehîd kirin. Ew li JITEM'ê kuştin. Di sala 1994'an de ez hatim Stenbolê. Min ji berê ve gelek ji huner, edebiyat û muzîkê hez dikir û ji bo xebata di vî warî de daxwaza min hebû, ji ber vê jî min li NÇM'ê dest bi xebatê kir. Ev demek e ku ez Seroka Giştî yê NÇM'ê me.

KÎ YE?

Şerê dewlet bi

NÇM, ji roja ku saz bûye heta îro, zora dewletê nafi ewrekî reş û tarî ji serê kêmbûye. Berhemên wan hatine qedexekirin û berhevkerin, xebatkarên wan hatine girtin, îşkenceyê li wan hatine kirin. Cara dawî, li ser îfadeya îtirafkarekî, gelek xebatkarên NÇM'ê ya Diyarbekirê hatin girtin. Di nava wan de Seroka Giştî ya NÇM'ê Nuran Şen jî hebû. Hevalê me RAHMÎ BATUR bi Nuray Şenê re, li ser vê bûyerê, jiyanê wê û xebata NÇM'ê hevpeyvînek çêkir.

Ji ber ku hûn jin in, di xebata we de tu asteng derdikevin pêşiya we? —Rewşa civaka kurd, rewşa welatê kurdan tê zanîn; li ser civaka kurdan hê jî giraniya feodalîyê heye, li ser kurdan tehrîbata dagirkeriyê heye. Li Kurdistanê girêkê di jiyana de ye û bişkiwandina vî girêkê gelek zehmet e. Piştî ev çend têkoşîn ku di van salên dawî de hatiye dayîn, hê jî şexsiyeta me paşketî maye, zêde bi pêş neketiye. Ji ber vê jî asteng derdikevin pêşiya me û ez bawer im wê ev asteng bi şoreşê werine rakirin.

Di xebata we ya NÇM'ê de (Navenda Çanda Mezopotamya/ Mezopotamya Kültür Merkezi) jî gelo asteng derdikevin pêşiya we, ku derdikevin ev çi ne?

—Na, di nav NÇM'ê de zêde asteng dernakevin. Di vê saziyê de kî bixebite, keda wî/wê û xwe ji wezîfeyan nede paş, bi hêsanî dikare bi pêş bikeve. Yanî di nava jin û mîran de ji cudatiyêke zêde tune.

NÇM'ê hedef daye ber xwe û ji bo ku bigihîje wan hedefên xwe çi dike?

—Mezopotamya ji gelek qewman re bûye dergûş û li ser vî welatî gelek şer û ceng çêbûne, ji ber ku erdekî bi xêr û bêr e, bi av û bereket e. Û gelek qewm hatine qirkirin, wînda bûne, çûne. NÇM çand û hunera gelên ku li vî welatî jiyane û gelên ku hê dijîn, dixwaze ji tarîtiyê derxîne ronahiyê, lê xebat bêhtir li ser çand û hunera kurdan e. Wekî ku tê zanîn, gelê kurd bi hezaran salan li ser erd û axa xwe köçber e; di bin esaretê de, di bin zîlmê de dijî. Her wiha çand û hunera kurdan jî di bin talan û asimilasyoneke dijwar de ye. Em dixwazin li dijî vê zîlm û talanê derkevin, çand û hunera kurdî xurt bikin û arşîveke tekûz ji bo pêşerojê amade bikin....

Îro ku hûn li paşeroja saziya xwe dinihêrin, hûn dikarin bibêjin tiştên me dixwest bi destên me ve hatin?

—Bi rastî em nikarin bi hêsanî bibêjin, tiştên ku me dixwest hatin. Lewre, ji bêtêcrûbetiya me, bêîmkaniya me bigirin heta bigihîje dijwariya neyar, heta bigihîje parçebûne welat, li pêşiya me gelek asteng hebûn û hene jî.... Em ji ber van kêmasiyan negihîştine armanca xwe, lê tiştên heta niha ku me kirine jî ne hindik in. Di sala 1991'î de

me li bajarê Stenbolê NÇM ava kir, pişt re li başûrê welêt, li Hewlêrê me şaxeke NÇM'ê vekir, li bajarê Îzmîrê, li Edeneyê û li Amedê jî me şaxên NÇM'ê vekirin, lê dewleta tirk bêmna kurdayetiye jî çi were, dixwaze wê ji holê hilde....

Dewletê heta îro çi asteng derxistine pêşiya we?

—Her tim diavêjin ser navend û şaxên me. Carinan polisên maliyeyê, carinan jî yên siyasî tî. Û gava polisên maliyeyê tî, ên siyasî jî bi xwe re tînin. Xebatkarên me dixin binçav, wan di bin îşkenceyê de derbas dikin, aletên me yên muzîkê, kostumên şanoyê, arşîva me û temamî aletên me bela wela dikin, dişkênin û hinekan jî bi xwe re di bin.

Bi kompoyan dixwazin saziya me bidine girtin, mor bikin; şaxa me ya Îzmîrê bi vî awayî hate girtin, hê jî girtî ye. Lê van rojan emê vekin.

Ez dikarim bibêjim bêtî îstisna te-

mamî xebatkarên me xistine binçav, di îşkenceyê re derbas kirine. Şevên ku em tê de başdar bin, dawetên ku komên me tê de hebin, tî qedexekirin, berhemên me tî berhevkerin û di heqê me de li dadgehan doz tîne vekirin. Waliya Stenbolê, ji gelek cih û salonên dawetan re talîmat rê kiriye ku komên me dernexin. Dibêjin ku "Ku hûn komên NÇM'ê derxin em rê nadin dawet û şevên we."

Ev talîmat bi nivîsê hatiye belavkirin an bi devkî hatiye gotin?

—Bi nivîsê, lê ev nivîs nedane kesî. Bi tenê didine nîşan û dibêjin em li gorî vê talîmatê destûra we didin. Mesela, KAYDER'ê ji bo şahiya salvegera damezrandina xwe xwestibû ku şevêkê çêke, lê polîsan ji wan re gotine: "Em destûr nadin wê, ji ber ku di şeva we de komên NÇM'ê jî we derkevin stranan bibêjin." Vê talîmatê nîşanî wan didin. Cara diduyan jî destûr xwestin, dîsa nedan û mecbûr man ku komê me dernexin. Komeke me ya zarokan heye, dema em dixwazin wan rê bikin Ewropayê astengan derdixin. Yanê ji bo têkiliyê me û gel ji hev qut bikin û me biftîsinin, çi ji destê wan tê dikin. Em jî bang li gel dikin, dibêjin ev sazî ya we ye, lê xwedî derkevin. Gel jî bersiva me dide; li saziya xwe xwedî derdikeve.

Li Diyarbekirê hûn hatin girtin û demekê di girtigehê de man; hûn dikarin behsa vê girtinê bikin, sedemê girtinê



ranên kurdî re...

we çî bû?

– Ji destpêka havînê û wir de, dewletê zora li ser saziya me zedê kir, bi komployan bi ser me ve hat. Ji şaxa me ya Îzmîrê dest pê kir, bi avêtina ser şaxa Edeneyê û paşê jî girtina ser naven-da me, dewletê kirinên xwe domandin. Bûyera Diyarbekirê û ew komployan din, bi hev ve girêdayî ne. Beriya ku ez herim, li wir 14 xebatkarên me xistin bin çav, îşkence li wan kirin, ji ber vê yekê li şaxa me ya Diyarbekirê valahî çebû, di xebatê de kêmasî derketin. Ji bo çareserkirina pirsgerêkan ez çûm Diyarbekirê. Lê hê min hevalên me yên wirê nedîtibûn, roja 10.11.1995'an avêtibûn ser saziya me. Çek û bombe-yên ku bi xwe re biribûn, danîbûne ser maseyê, bi nûçevanê rojnameya "Söz"ê wêne dabûn kişandin û gotî-bûn: "Me ev çek û bombe li vir bi dest xistin." Ez wê demê li ÎHD'ê bûm, de-ma ku ji ÎHD'ê derketim, polisên sivil ez jî girtim û hê em di erebeyê de bûn, dest bi lêdanê kirin. Ew roja min a ye-kemîn bû ku ez li Diyarbekirê bûm û hê jî ez neçûbûm saziyê.

Ji bo girtina we çî sedem didane nî-şan?

– Yekî "îtirafkar" li ser me dabûn, xeberdan, ku me ew şandiye serê çiyê... Wexta ku wî xortî li navçeya Dara hênê (Gencê) digirin, jê dipirsin: "Kê tu şan-diye?" Ew dibêje: "Kesî ez bi rê nekiri-me, ez bi xwe hatime." Lê dema berê çekan lê rast dikin û wî bi kuştinê tehdît dikin, ji tirsan dibêje: "NÇM'ê ez rê

kirime." Em li ser vê yekê girtin. Lê wî xortî li dadgehê got ku dema berê çekan lê rast kirin, ji tirsan gotiye, "NÇM'ê ez rê kirime, lê ev yek ne rast bû, wê gavê NÇM hate bîra min, min jî ew got."

Di bin çav de çî ji we dixwestin?

– Ji min tîkiliya saziyê û PKK'ê dixwestin û digotin: "Hûn li wir li ser navê PKK'ê xebatê dikin, xortan perwerde dikin û dişînin çiyê. Hûn bi talîmatên PKK'ê xebata xwe didomînin" li ser disekinin û digotin: "We divê bibêjin partî, NÇM û we divê bibêjin roj-name, hûn tev li ser navê PKK'ê xebatê dikin, em bi we dizanin." Û dixwestin ku em bi vî rengî îfadeyê bidin. Yekî ji wan digot: "Kurd jî heye, Kurdistan jî heye, lê qehreman mehmîdçîkên me hê nemirine, em yek xîçîkî nadine we, hûn dikarin werin bistînin."

Berhemên we yên ku hatine qedexekirin kîjan in?

– Kovareke me ya çand û hunerî ya bi navê Rewşen heye û ji 1991'an vir de, her hejmara wê kovarê hatiye berhevkirin. Kasetên ku heta niha komên me ku derxistine, bi temamî hatine berhevkirin, bi taybetî jî deverên ku kurd lê gelek in, kasetên me tene berhevkin. Ji 13 listikên şanoyên me tenê me kariye ku em du listikên xwe pêşkêşî temaşevanan bikin û di heqê van her-duyan de jî doz vekirine.

Di kîjan beşa çand û hunerê de, çî

berhemên we çêbûne heta niha?

– Em ji muzîkê dest pê bikin. Li Stenbolê du hozanên me hene: Ganî Nar û Xanemîr. Hê jî li NÇM'ê kase-tên Ganî Nar dermeketine, ew demekê di girtigehê de ma, niha amadekirina kaseta wî heye. Kaseteke Xanemîr derketiye. Li Stenbolê bi navê Koma Amed, Koma Çiya, Gulên Mezrobotan (Koma zarokan), Koma Agirê Jiyan, Koma Rojhilat, Koma Gulên Xerzan; li Edeneyê Koma Rewşen û li Diyarbekirê jî Koma Azad heye. Û li her çar şaxan jî komên folklorê hene.

Di aliyê şanoyê de li Stenbolê Şanoya Jiyan Nû heye ku heta niha 13 listik amade kirine. Li Îzmîrê Şanoya Hêvî, Li Diyarbekirê komeke me ya şanoyê heye û li Edeneyê jî amadekirina komekê heye.

Berê resamên me hebûn, lê ji ber ku cihê me teng bû, nikaribûn berhemên zedê derxînin, lê me cihekî nû vekir, êdî li vê derê wê berhemên xwe derxin pêş nixandina temaşevanan. Ev salek e ku me giraniya xwe daye ser hunera dîtbarî, wekî sînaemavanên alternatîf Ahmet Soner û Hüseyin Kuzu dest bi vî karî kirin. Me di vî warî de kurs vekir û nêzikî 40 kesî di vê kursê de perwerde dibin. Êdî di vî warî de jî berhem derdikevin holê, kurtêfilman dikişînin.

Weşanxaneya we heye, nebe ji bo çî tune?

– Di vê demê de weşana kurdî bi rastî jî gelek girîng e û di vî warî de gelek zehmetî hene. Zêde nayên firotin, dewlet nahêle bigihîje hemû deverên welat. Weşanxaneyê me tune, lê em dikarin kitêban derxin û ji vê gavê pê ve emê li ser derxistina kitêban kurdî jî bisekinin.

Nêzikahiya rewşenbîr û hunermendên kurd ji saziya we re çawa ye?

– Hunermend hinekî teng nêzîkbûn, hinek kêmasiyên me jî hebûn, lê hunermendan girîngiya vê saziyê baş nenirxandin. Me di vê saziyê de tevgera hunermendan çêkir, me gelek caran bang li hunermendan kir. Lê tu deng ji wan derneket. Yekîtiya û rêxistin ne tenê saziyê, her wisa hunermendan jî xurt dike. Banga me zêde nedihat fêmkirin. Lê piştî cihê me yê nû nêzikahiya hunermendan germtir bûye. NÇM saziyê ku kurdan a neteweyî ye, ji ber vê jî ew kesên ku zerar nedabin kurdan, dikarin di vê saziyê de cihê xwe bigirin. Deriyê me ji hemû kesan re vekirî ye û kesên ku werin, em ji wan re nabêjin, çima hûn heta niha nedihat. Niha hinek xwedekar dixwazin ku kaseteke dinî dagirin û ji me alîkarî xwestin, me jî ji wan re negot na. Emê alîkariya wan bikin û di nav sê çar mehan de emê kaseta wan derxin. Û taybetiyeke rewşenbîrên me heye ku xwe nadin ber wezîfeyan û ji wezîfeyên xwe direvin. Em nikarin bibêjin me her tişt rast kiriye, kêmasiyên me jî hene.

✓ Mezopotamya, ji gelek


qewman re bûye dergûş û li serê gelek şer û ceng çêbûne, gelek qewm hatine qirkirin, winda bûne, çûne. NÇM çand û hunera gelên ku li vî welatî jiyane û ên ku hê jî dijîn, dixwaze ji tarîtiyê derxîne ronahiyê, lê xebat bêhtir li ser çand û hunera kurdan e.

✓ Bêyî îstisna temamî

xebatkarên me xistine binçav, di îşkenceyê re derbas kirine. Şevên ku em tê de başdar bin, dawetên ku komên me tê de hebin, tîn qedexekirin, berhemên me tîn berhevkin û di heqê me de li dadgehan doz tîne vekirin. Walîtiya Stenbolê, ji gelek cih û salonên dawetan re talîmat rê kiriye ku komên me dernexin.

✓ Ji min tîkiliya saziyê û

PKK'ê dixwestin û digotin: "Hûn li wir li ser navê PKK'ê xebatê dikin, xortan perwerde dikin û dişînin çiyê. Hûn bi talîmatên PKK'ê xebata xwe didomînin." Yekî ji wan digot: "Kurd jî heye, Kurdistan jî heye, lê qehreman mehmîdçîkên me hê nemirine, em yek xîçîkî nadine we, hûn dikarin werin bistînin"



Seîd Yûsif: 'Govenda dilan'

Li gorî Seîd Yûsif gotinên stranekê divê "bi hêsanî bîn fêmkirin, xeberên wê vekirî bin, ne gelekî dirêj be, her kes têbigihîje, ku zarok jî têbigihîjin."

Hunermendê gelêrî Seîd Yûsif li Qamîşlo hatiye dinyayê. Ev 28 sal e li tembûrê dixê, şîran dinivîse û awazan çêdike. Seîd Yûsif tîkiliya xwe û muzîkê wiha nîşan dide: "Di taliya sala 1965'an de cîranekî me hebû, tembûra wî hebû. Ne tembûrvanekî bi navûdeng bû; lê ji xwe re carinan li tembûrê dixist. Ez bi dengê tembûrê diçûm mala wan. Min carinan tembûra wan dibir lê dida. Dema min li mektebê dixwend, digotin dengê te xweş e. Min carinan stranên erebî digo-

tin. Wê çaxê kurmançî qedexê bû. Nêzikî salekê ez çûm mala cîranê xwe, ez li ber destê wî hîn bûm. Paşê ez bi xwe hesiyam ku ez hinekî fêr bûme, ez dizanim tiştêkî lêxim."

'Rewşenê'

Seîd Yûsif di wan rojan de tembûreke biçûk ji xwe re peyde dike, di 2-3 salan de xwe hîn dike. Navê helbesta wî ya yekemîn "Rewşenê" bû. Plaka wî ya yekemîn di sala 1967'an de derket. Piştî bi salekê, di sala 1968'an de çû Radyoya Kurdî li Bexdayê. Navê wî belav bû û bû yek ji hunermendên kurd ê herî xurt.

Yûsif di sala 1967'an de çû Bê-

rûdê. Di wan salan de gelek plak çêkirin û stranên wî di radyo û televîzyonan de diweşyan. Di sala 1970'yê de jî bi navê "Newroz" grubeke muzîkê ava kir. Hunermendê bi navûdeng Mihemed Şêxo jî di nav grubê de bû, li tembûrê dixist. Piştî re bi destûra Hikûmeta Lubnanê grub kirin "Civata Kurdî ya Hunerê Milî." Civatê



Seîd Yûsif, rojên xortaniyê

heta sala 1975'an dewam kir, bi şerê Lubnanê re hunermendên kurd tev de ji Lubnanê derketin.

Stranên evînê

Heta niha 25 kasetên Seîd Yûsif derketine. Kaseteke ku bi tevahî ji şîrên Cegerxwîn pêk tê, amade dike. Bi navê "Govenda Dilan" kitêbeke wî weşiya. Bi sedan şîr nivîsandine, beste çêkirine.

Seîd Yûsif, li ser mijara stranên xwe wiha dipeyive: "Ez ji destpêkê ve pir ji stranên folklorî hez dikim. Bi taybetî ez ji yên li ser gili û gazinan, yên evînî û evîndariyê pir hez dikim. Di kultura me kurdan de, yên li ser şer, pevçûn û kuştinê jî heye, ez ji wê hez nakim. Ez dikarim bibêjim ku mijara stranên min ji sedî not li ser evînê ye. Piranî evînî û civakî ne, lê ne siyasî ne."

Gotinên stranan divê çawa bin?

Seîd Yûsif piştî dest bi stranê kir, di demeke kurt de helbest jî nivîsandin. Piraniya gotinên stranên xwe ew dinivîse. Taybetiyên nivîsandina gotinên stranan wiha nîşan dide: "Ya yekemîn divê armanca wê ya nêzik hebe û her kesî têbigihîje. Ya duduwan, divê xeberên wê jî vekirî bin, yanî ne aloz û tevlihev bin û bi zehmetî neyê fêmkir-

rin. Ya sisêyan, divê ne gelekî dirêj be. Ya çaran, divê bi hêsanî bête fêmkirin. Gava gotinên stranê hêsan be, zarok jî dikarin têbigihîjin."

Bi notayê muzîka gelêrî

Seîd Yûsif her çiqas tu mektebên muzîkê nexwendibe jî, stranên xwe li gorî notayê çêdike. Hunermendên bênotayê muzîkê çêdikin emirkurt dibîne. Seîd Yûsif muzîkê jî bo xwe wek av û hewayê dibîne û dibêje: "Çawa ku mirov nikare bêav û hewa bijî, ez nikarim bêmuzîkê bijî. Muzîkê bûye parçeyek ji jiyana min, ew bûye hevavalek min a bêdawî."

'Piştigiriya gel kêm e'

Seîd Yûsif, rewşa muzîka kurdî ne baş dibîne û wiha dinirxîne: "Muzîka kurdî bi tevayî li paş e û bi pêş neketiye. Îro tu hemû hunermendên li Ewrûpayê bicivîni ser hev, tuyê nikaribî ji wan komeke baş derxîni. Rewş gelekî xerab e. Ev delîlek û îşaretek e ku muzîka kurdî gelekî fireh nebûye û muzîka kurdî bûye hêstîrê herêma ku ew hunermend jê ye. Ji ber ku piştigiriya gel jî, ji hunermendan re kêm e, muzîka kurdî seqet û bawî maye."



Seîd Yûsif: "Îro tu hemû hunermendên li Ewrûpayê bicivîni ser hev, tuyê nikaribî ji wan komeke baş derxîni."



kadınlar;
emek, barış
ve özgürlük için

8'ê ADARÊ, Roja Jinên Kedkar ên Dinyayê ji aliyê derdorên demokratîk ve bi çalakîyan wê bê pîrozîkirin. Çalakî wê di 6'ê adarê de dest pê bikin û heta 10'ê adarê ji aliyê HADEP, KESK, IHD, SKD û hwd. li Îzmirê, Enqerê û li Stenbolê bêne li darxistin.

HADEP, IHD, KESK (Konfederasyona Sendikayên Karmendan) û SKD (Komeleya Jinên Sosyalîst) wê roja 6'ê adarê bi civîneke çapemeniyê dest bi çalakîyan bidin destpêkirin. Roja 7'ê adarê jî, li Meydana Taksîmê saet li 18.00'ê êvarê bi awayekî girseyî daxuyaniyê bidin çapemeniyê û pişt re bazineya (helqe) aştîyê wê bi destê hev bigirin. Dîsa di van rojan de aîş, belavok û nîşane wê

werin belavîkirin.

Li Îzmir, Edene û Enqereyê jî dîsa bi destê HADEP, KESK SKD û IHD'ê çalakîyên pîrozîkirinê tên amedekirin. Li rêxistinên HADEP'ê yên van deran jî wê bi civînan girîngiya rojê û maneya 8'ê adarê bêtê eşkerekirin. Li hêla din Evrensel Kültür Merkezi jî heftiya di navbera 1 û 10'ê adarê de wekî Heftiya Jinên Kedkar ên Dinyayê îlan kir. Di vê heftiyê de wê çalakîyên wekî nîşandana filmên derbarê jinan de, bê sazîkirin. Li gorî agahiyên ku rayedarên navendê didin, wê di nava vê heftiyê de li ser jinan 3 filmên ji Tirkiyeyê û 8 filmên biyan bînan pêşkêşîkirin.

RÛDAN



Hiqûqnas û
endamê
Parlementoya
Kurdistanê ya
Derveyî Welat
Prof. İsmet
Şerif Wanlî

Hiqûqnasên kurd yekîtiya xwe ava dîkin

**Kurd, çi li derve û çi jî li hundirê welêt, ji bo dewletbûnê
sazî ava dîkin û hem jî xwe bi rêxistinî dîkin. Piştî avakirina
Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistanê niha jî hiqûqnas lê
dixebitin ku yekîtiya xwe damezirînin.**

Hiqûqnasên kurd li derveyî welêt piştî avakirina yekîtiya rojnamevanên Kurdistanê jî bo Yekîtiya Hiqûqnasên Kurdistanê jî di 2 û 3'ê adarê de dest bi xebatê dîkin. Komîteya Amadekar ku ji van kesan pêk tê Prof. İsmet Şerif Wanlî, Eb. Serhat Bucak, Eb. Veysel Akay, Eb. Celal Vural rêberîtiya vê xebatê dîkin. Civîn li bajarê Almaniyayê Melle/Osnabrück tê li darxistin.

Amanca pêwistiya avakirina saziya Hiqûqnasên Kurdistanê jî wiha didine zanîn: "Kurdistan li dijî îradeya gelê me ji aliyê dagirkeran ve hatiye parvekirin. Di dîroka me de lêgerînên azadiyê bi sedemên cur bi cur yên siyasî û civakî re û di encamê de, neçêbûna yekîtiya neteweyî bûye sedemê têkçûnê. Lê îro pêvajoya dîrokî ku em di nav de ne, ji bo welatê me wextekî girîng îfade dike. Rizgarbûn û bi vê re dewletbûn, di vê pêvajoyê de wek pirsgrêkeke bingeîn li pêş me ye.

Di giştîya welatê me de, bi taybetî li bakur û li başûr, di riya rizgarbûnê de hêviyên mezin û pirsên dîrokî derketine holê. Ev hemû jî bo, ji holê rakirina parçebûna Kurdistanê, pêkanîna yekîtiya neteweyî û ji bo giştîna dewleteke neteweyî mercên vekirî

ne..... Gelekî ku, bixwaze di cihana hemdemî de bibe yek ji wan gelên bi şexsiyet û serbixwe, pêwîst e saziyên xwe yên civakî, siyasî, îdarî, artêşî, aborî û zanistî çêke û bîne holê. Di hemû civakan de şervan, politîkzan, mirovên zanist û hunermend, birêvebir ji zikê civakê dertên. Ji bo gihîştina civakeke demokrat û azad ev hin bêtir bi wate ye. Bi vê baweriyê hiqûqnasên ku ji civaka me derketine û yên derdikevin, yekîtiya wan a rêxistinî wekî wezîfeyeke dîrokî û bi lez û bez li pêş me ye."

Komîteya Amadekar mercên endambûnê jî diyar dike ku "Ji bo berendamiya Yekîtiya Hiqûqnasên Kurdistanê tu cudabûna siyasî, olî, kameyetî û" hwd. nîn in.


Di banga xwe de Komîteya Amadekar dide eşkerekirin ku berê jî yekîtiyeke bi vî rengî li Ewropayê hatibûye damezirandin, lê fesh bûye û niha nîn e.

Ji Tirkiyê jî gazî hin komele, hiqûqnas û parêzer (ebûqat) kirine, wekî TOHAV (Weqfa Lêgerînên Huqûqên Civakî), ÇHD (Komeleya Hiqûqvanên Hemdemî), baroyên bajarên Kurdistanê û ji baroya Enqerê, Edene, Stenbolê, Îzmirê, Antalyayê, Mîrsîn û Konyayê.

NAVENDA NÛÇEYAN

TÎŞK

LERZAN JANDÎL



Mamostayê domananê kurmancan biyene

Her şarî de, her welatî de mamostayê domanan est ê. Nê mamostayî musnayena domanan de, avêşiyena zanayena dînan de, dewlemend biyena hunermendiya dînan de; avêşiyena cematî de rolode zaf girs kay kenê. Nayê rê jî karê mamostatiye, ked û emegê mamostatiye nêno pêmenayene. Na derheq de xêlê mîsal û numûneyî est ê.

La belê mamostayê domananê kurmancan biyene karode bîno û gelê dîmenziyonê xo yê bînî est ê. Serbeta ke domanê kurmancan dest de îmkânê domananê şaranê bînan çînê, ze şarê xo ê jî bîndest ê. Her çiyê dîno amo qedexekerdene. Karê mamostayanê domananê kurmancan, mamostayanê kurmancan tayîna giran o, tayîna zor o.

Her çîqa zaf kan jî niyê, organîzasyonê mamostayanê kurmancan xêlê newe jî niyê. Serba naye jî kêmasî, bêtêcrubetiye, hestkerdena kedî de qelsiye est a.

Almanya de rojanê 05.02 ra hetanî 07. 02. 1996 suka Hildesheim de ebi hetkariya hukmatê eyaletî civînade mamostayanê kurmancan amê amadekerdene. Bê guman civîne bi xo çiyode dîrokî biye. Ha mamostayê kurmancê ke mekteban de dersanê kurmancî danê, ha mamostayê Kurmancê ke dersanê tirkî danê, amê bi. Her kesî qasê xo, gor ked û emegê xo, hetanî sîndorê înteressa xo, xo avê berd bî. Şaxê xo yê zanayene de xo kerd bî zixm. Mamostayanê ma de waştene zaf girse, biqedr û biqîmete biye. Ebi can û ebi înterese goş nêne re referentan ser. Nê çiyê pozîtîf ê. Ganî tim avê şor ê.

Kaleka naye de hetê qels jî zaf bî. Ma şîkînimê nê qelsiyan niya rêz keme: -Her çî ra ver kêmasiya materyalê wenden û nivisnayene, bi kilmîyê materyalê musnayene xêlê girs a. Bê guman sebebê naye est ê. Kaleka naye de materyalanê viraştîyan da metodê kanî amê xebetnayene yan jî zafêriya nê materyalan tercûme kerdene materyalanê xerîban a.

-Girêdayê xalê corênî, serbeta ke materyalê musnayene zaf şenik ê, her kes gazinanê xo keno. La belê kes bi xo dest nêerzeno ci, materyalan bi xo nêvirazeno. Hurêndiya naye de çimê xo tede ro, ke cayê yan jî kesê bîni serba dînan materyalan bi xo amade kerê. Eke jû mamostayî serba xo çiyê viraştî jî, xebero zaf kesan ci ra çin a.

-Zaf mamostayî karê xo ebi metodanê karan kenê. Kes karê xo, rojanê yan jî aşme de rey cayê ra/cayê rê nênivisneno. Ma waşt ke bîmusîme, pê bizanîme, ke mamostayê kurmancan se xebetîne? Domananê xo, ma û piyanê dînan çîqa şinasnenê? Problemê mamostayan yê didaktîk û metodîkî çik ê? La belê ze yê bînan cewabê konkretî nêyamê/ niyamê.

-Mamostayan wertê xo de kominikasyonode girs nêviraştî. Xebera xo jûbînî ra zaf çin a. Na çend seriyo tenê sukanê Almanya de serba domananê kurmancan mekteban de projeyî amê viraştene û nê dewam jî kenê. La belê wertê mamostayanê nê projeyan de û wertê mamostayanê nê projeyan û wertê mamostayanê bînan de kominikasyon ya qe çin o, yan jî zaf qels o.

-Wertê mamostayan de şiyena înfarmasyonan ya qe çin a, yan jî zaf şenik a. Na derheq de sentralîzekerdena karî pêwîst a. Ganî înfarmasyonî pêro jû sentral de kom bê, ke kesê bînî, mamostayê bînî bişikiyê nînan ra îstîfade bîvinê.

-Çiyê ke amo yan jî êno kerdene, nênivisîno. Nê projeyî se ebi senê enwayî amê avakerdene? Hetê brokrasî û mamostayan de problemî, kêmasî, zahmetî çik bî? Çiyê pozîtîfî çik bî? Hetê şagirta, ma û piyanê dînan û mekteban de porblemi, kêmasî, zehmetî çik bî?

Dûmahîk esto

Hopanî hopanî



Zargotineke me ya zengîn heye, ku jê re edebiyata devkî jî tê gotin. Ev zargotina me li hêvî û benda berhevkirinê û berhevkarana e. Her wiha ew li gorî mijarên xwe, di nav xwe de li gelek waran parî dibe, wekî: Gotinên pêşyan, biwêj, çîrok, çîrçîrok, çîvanok, xeberojk, kilam, stran, metelok, mamik, tiştanok, manî...

Bi saya vê zargotinê mirov dikare gelek tiştinên hêja xweş bi dest bixe. Çawa? Carek, her ziman xwediyên hin taybetiyên vegotinê, şayesê (teswîrê), qaliban û biwêjan e.

Ev yek jî, bi qonaxa dem û salan pêk hatine û di nava gel de bûne xwedî wate û mane.

Îcar ku em li ser celebên wan rawestin, em dibînin ku hin ji wan jî bo zarokan û yên din jî, jî bo mezinan e. Di vê nivîsê de jî, bi tenê me xwest em çend heb stranên zarokan mîna nimûne pêşkêşî we bikin.

Ew nîrx û hêjahiyên me, hem li ber mirinê û hem jî li ber windabûnê ne. Zarokên me jî, jî wan bêhay mezin dibin. Ev stranên li jêrê, bi awayekî muzîka repê, bi tempoyeke giran tene strandin. Zarok di dema leyistîna de jî hev re dibêjin an jî, çaxa ku li cem hev kom dibin diavêjine ber hev.

Gelekî jî wan stranan, hêja ne ku bibine noli xêzefilm (kartûn) û di televîzyonê de, bêne nîşandan.

Min divê ku ez li ser awayê berhevkirina wan jî çend tiştan bibêjim. Ez têkilî zimanê wan nebûm. Çawa tene gotin min welê tomar (qeyd) kir. Bi ya min gere ev kar jî wisa bê kirin. Karê berhevkirina zargotinê, karekî zehf bihîzyar (hesas) e û pisporiyê dixwaze.

Hedlîlikê

*Hedlîlikê medlîlikê
Derî veke li dayikê
Dayik çûye zozana
Şîr kiriye guhana
Çîlo daye ber qiloçana*

Mamo

*Mamo dibê bi tirkî
Şûrê Mamo dibiriqî
Ew Mamokî tolaz e
Şîtil mîtil gewlaz e
Gewlazên min qetiyane
Li andokê rijiyane
Hebo hebo jîmaro
Para keko çînaro*

Seyda

*Herê Seyda
Simbêl qeyda
Rojâ îne
Çû Farqînê
Heskê kirî
Girarê tevda*

*Garan çû
Golîkê berda*

Mamê Dîno

*Yek dudo sisê
Çeqla fisê
Mamê dîno
Çavheşîno
Simbêlboqo
Çavzeloqo
Pêşk baran hat
Ji Alah da
Ser Kaniya Evdîlah da
Evdîla bavê Fatê
Horî çûnê leqatê
Horî bîst û sisê ne
Ser Kaniya Nîqrê ne
Gava nîqrê hejiya
Dû ji qelûnê kişiya
Sirm ji ebayê weşiya*

Hopanî

*Hopanî hopanî
Keziya min a panî
Avête golanî
Gola min fişefiş e
Kekê min çawîş e
Çawîşê biçûk e
Min jê re anî bûk e
Bûka Hesên Begê
Seva ser kulekê
Wê sevê hiltînim
Wê gulê datînim
Gul gula hidada*

*Derî li min rada
Çûne qulika tarî
Teyr tê da dinalî
Teyro çî ye, çî ye?
Baskê min şikiye
Hevrişmê Fatma Nebî ye
Li serdara derî ye
Dizan biriye
Dizo ku da ku da?
Bi aliyê deştê da
Xencer di ber piştê da*

Kê kir

*Kê kir min kir
Cehnem lê kir
Avê rengê
Dest qulingê
Hestiyê kewê
Li bin mêwê
Mêw qetiya
Ji hacika
Ji maçika
Ev hêlîn e
Ev maçika*

Rovî

*Rovî rovî rindik
Serê dûvê rovî kincik
Rovî çûye mala xala
Bar kiriye barê dara
Bijmêre ku ne bîst û çar e
Bifiltîne qorika rovî
Hişk û teredar e.*

God û Xwedê

Mirov, di kahînatê de tim bi bawerî bûye. Îro jî, mirov bi xwedayên cuda bawerî dikin û baweriyên cur bi cur hildibijêrin. Baweriya yekemîn jî, ji agir dest pê kiriye, heta xwedayê yekane jî, bi felsefeya Zerdestî peyda bûye. Felsefeya Zerdestî agirê pîroz ditiye û xwedayê yekane jî, Ahuramazda daye nasîn. Îro yên ku bi xwedayê yekane bawerî dikin, tev bi Ahuramazda bawerî dikin, lê nav guheriye, li her deverî û di zimanên cuda de, bi navên cur bi cur hatiye binavkirin.

Di navbera olan de tim şer û ceng hebûye û hîn jî ew rewş berdewam e. Lê belê, di felsefeyê û ola Zerdestî de zordestiya tu tuştî tune. Her kes bi çar bawerî dike, çî dixwaze, azad e. Lê, olên din ev kevneşop nedomandine. Kijana ol bûye serdest, li ser ya din zordestî kiriye û xwestiye wê ji holê rake.

Mirovan ne bi tenê bi xwedayan bawerî, her wisa, bi ajalên (heywanan) jî bawerî kirine an jî, ew pîroz dîtine û parastine. Pîroziya ajalên di ol û felsefeyê Zerdestî de jî hebûye. Ji ber ku germahî bi leşê ajalên re heye û germahî jî tevayê agir e, ji terefê zerdestîyan ve pîroz hatine dîtin. Ji ber vê yekê jî şerjêkirin û xwarina wan qedexe bûye.

Di mîtolojiya ariyan de, gud (îro di-

bêjin ga, gayê cot), xezal, şer û eylo pîroz bûne. Şer, ji bîr ku bi hêz e û eylo jî ji ber ku tim bilind firiye. Pîrozbûna gud û xezalê jî, diyar e ku ne ji bo goştên wan e. Nexwarin û şerjênekirina ajalên berî Zerdestî jî hebûye. Çawa di mîtolojiya ariyan de, gud, xezal, şer û eylo ajalên sembolîk û pîroz bûne; her wisa jî, di ola Zerdestî de jî pîroziya wan dihat parastin.

Felsefeya ku Zerdestî dinivîsîne wekî ol têtê pejirandin û xwedayên mîna Va, Valû, Ra, Tau û hwd. betal dibin. Ahuramazda wekî xwedê û Ahrîman jî mîna şeytanê îro têtê pejirandin. Li gorî hinek misilmanan; Zerdestî jî, wekî Musa, Îsa û Muhamed, pêxemberekî xwedayî bûye.

Baweriya xwedê û pîroziya ajalên di nava gelek gelan de heye. Îro jî em dibînin ku hinek ajalên, sembolên netewe û dewletan in. Li sar alên wan şer û eylo û hwd. hene. Di vê sedsalê de, ajalên hîn jî pîroziya xwe diparêzin. Diyar e ku mirov zû bi zû ji baweriyên qut nabî.

Li Swêdê xezalên spî hene. Di 1993'an de, civînek der barê nêçîra wan de li dar ket. Di civînê de hate zimên ku divê xezalên spî bîn parastin. Ji ber ku her diçe hejmara wan kêm dibê. Wiha digotin: "Ev xezalên han,

1500 sal berê pîroz bûn. Niha, divê em wan bixin bin parastina taybetî." Mirov li Hindistanê çêlek, bizin û fila spî pîroz dibînin.

Mînakên ku me ta vir dan, tev li ser Gud in. Gud di mîtolojiya ariyan de pîroz bû. Îro Gud jî aliyê hinek netewe ve wekî xwe dê têtê nasîn. Di nava netewe û zimanê ewrûpî de, ji xwedê re dibêjin "Gud". Gud; bi kurdî ya 4000 sal berê, bi zaravayê "Hattî" (îro bi wateya hat e) têtê wateya ga. Netewe û dewletên ku ji xwedê re dibêjin Gud, Norwêç, Danmêrk û Swêdî ne. Ga, bi Swêdî "tjuv" e û di mîtolojiya wan de baweriya ga tune. Berî ku bibin xirîstîyan; pênc xwedayên wan hebûne. Xwedayên wan ev bûn: Mîna; Tor, Tîr, Oden Fraj û.... Ev gotin, bi îngilîzî di heman wateyê de ye. Lê fonetîka wê gad têtê bihistin, yanî Xwedê. Bi îngilîzî jî ga wekî "bull" têtê nivîsandin.

Skandinavi gelek caran "Herre Gud" (Ya xwedê) bi kar tînin. Harî; bi wateya xwe, di zimanê "Hattî"yan de here, yanî ciwanmêr e. Mînakên din: Min Gudayê xwedayan), Gud vet (Xwedê zane). Bi îngilîzî: O God (Ya xwedê), My God (Xwedê min), God (Xwedê).

Gelek peyvên kurdî û swêdî yên ku nêzî hev in, hene:


Kurdî	Swêdî
Nav, nam	Namn
Nêz	Ner
Por	Hor
Lêv	Lep
Navik	Navil
Neynûk	Nail
Brû	Öyebro
Hesp	Hest
Firo	Ro

Ev mînakên nêzîkbûna peyvên, nayê wateya ku kurd ji Skandinavyayê hatine Mezopotamyayê. Li gorî hinek dîrokzan, heşt hezar sal in ku kurd li Mezopotamyayê ne. Hingê, Skandinavya, li gorî dîrokzan di bin qeşayê de bûye, tu mirov li wir tune bûne. Yek ji wan dîrokzan jî, dîrokzan Radof Radoyan e ku bi eslê xwe bulgar e. Li gorî Radoyan, Mezopotamya dayika ol û kultura cîhanê bûye, wê tim kultur transfer kiriye, daye gerdûnê. Bi taybetî daye Ewropayê û hîn jî berdewam dike. Radoyan jî welatekî ewrûpî ji Yewnanistanê mînakê dide ku bi giraniya xwe kultura yewnanan a kurdan e. Yewnanistan tim bûye pira di navbera Ewropa û Mezopotamyayê de. Tiştên ku wê anîne nava xwe, wisa jî belav kirine, daye netewe û welatên din.

S.S DILPOLO

Dîn, kurdayetî û polîtîka

MEHMET METİNER



Rêberên mîna Seyîd Ubeydullah Nehrî, Mîr Bedirxan, Şêx Mehmed Berzencî, Mele Mustafa Berzanî, Seyîd Abdulqadir û Şêx Seîdê Paloyî di têkoşîna dîroka gelê kurd de derdikevin pêş. Ev rêber bi qasî nasnameya xwe yên milî, bi nasnameya xwe ya olî jî hatine nasîn. Çimkî wesfê wan î serwer, oldariya wan e. Ji ber vê yekê jî partiyên ku olê derdixin pêş, bêhtirî partiyên din piştigiriya kurdan distînin. Kurd naxwazin dev ji nîjdiya xwe û oldariya xwe berdin. Kurd bi van her du nasnameyên xwe ve, girêdayî ne. Ma em ji zanyarên mîna Şêx Ehmedê Xanî û Meleya Cizîrî re nabîne şahid ku ev her du mijar çawa bi hev ve, girê dane? Ma tiştê ku ew ji wê rojê heta vê rojê anîne û di çavên mirovên îro de pîroz kirine, ne ev e? Bi min ne tenê şexsiyeta wan î edebî, her wiha şarezatiya wan a di warê pêkanîna senteza van her du nîrxên kurdan de ye jî. Divê mirov vê rastiyê bibîne.

Sedemê tengaviyên kesên ku polîtîkaya xwe bi tenê li ser nasnameya gelê kurd ya milî didine meşandin û rê li xwe teng dikin, ev e. Em ji siyaneta (hurmet) ku ji dîne kurd re bidin nîşan biborin, têtê xuyan ku, êrîşbîrîna ser dîn ji xwe re kirine armanceke îdeolojîk. Divê mirov gunehê van kesên laîkperest û rewşenbîrên ateîst, ku bi navê kurdayetiyê, gelê kurd ber bi hinekên biyan ve didin, bibîne. Di civîneke ku di meha Remezanê de pêk hatibû, li ber çavên gelê rêveberê partiyê ku wekî partiya kurdan têtê xuyan, rabe di salonê de, li ber çavên

hemû kesî qedeha avê hilde, vexwe, mirov dikare çawa bîne ziman? Ev neyartiya dîn e, an nezaniya wî ya polîtîkayê ye? Di welatekî ku "beyreq-azan" tim û tim li ser lêvên Tansu Çillerê be jî, ma nayê zanîn ku polîtîka di rewşê çawa û bi rengekî çawa têtê kirin? Bi dîtina min ên ku nizanin, bila polîtîkayê nekin.

Mirov dikare rojiyê negire, nimêj neke. Dibe ku sosyalîst an jî laîkperest be. Bêşik ev terciha mirov e. Ez ne vê yekê rexne dikim. Esil tiştê ku ez rexne dikim; bi zanîn an ji nezaniyê ku serekatiya kurdan xwe li cihekî hemberî dîn dide nîşan. Bi min rêveberê kurd ku di meha Remezanê de rojî negirtina xwe nîşanî hemû kesî bide, xetayeke polîtîk a mezin e. Serekatiya ku siyaneta dîne kurd negire, di dawiyê de nikare tu feydeyê bide gelê kurd, her çendî bibêje ez li ser navê kurdan polîtîkayê dikim jî, nikare feydeyê bidê. Mirovên ku li meymandan diqîrin û dirûşmeyên mîna "Sosyalizm nemiriye, diji", "Emê sosyalîzmê bidin jiyandin", "Bijî tîkoşîna me ya çînî" diavêjin, li metropoleke mîna Stenbolê ku 2 milyon kurd têtê dijîn, dema bi zorê 100-150 hezar ray bistînin, ma navê ku rûn û hinekî li ser vê bifikirin? Bi min tu taleba kurdan a bi navê sosyalîzmê nîn e. Tu tirs wan li ber tîkoşîna çînetiyê jî nîn e. Ez yeqîn nakim ku peyva "Em bikin ku sosyalîzm bijî" ji bo kurdan wateyeke xwe heye.

Di tevgera kurdan de îro krîza nûneriyê heye. Di serekatiya kurdan de nasnameya dînî ne li pêş e. Di vîtrîna kurdan a siyasî û çandî de "şaxê oldaran" hema bibêjin ji binî ve nîn e. Di tevgera kurdî de krîza nûneriyê jî xeynî marjînaliya tevgerê, dibe sebebê sîcên din ku lê bibin bar. Weke "Ev komunist in, ateist in, bédîn in" û hwd. Û

ev bandor li gel dike. Heke hûn nabînin ku millet dibêje, "Dîne me, axreta me ji dest diçe", ji ber vê jî gelek kurd li rîyên din digerin, tiştê ku ez ji we re bibêjim tune.

Birêveber û rewşenbîrên kurd, laîkperest û çepgir; eynî mîna jakobenên fransîz û kemalistên tirk in. Ez di fêmkirinê de zehmetiyê dikişînim ka ji bo çî, ku tiştên gelê kurd tu caran qebûl nakin, dixwazin bi wan bidin qebûl kirin? Xuya ye hinek serokên kurd, berî kurdayetiyê, tîkoşîna îdeolojîk wekî armanc derdixine pêş. Fikra pevgerîdana tîkoşîna ji bo kurdayetiyê û tîkoşîna ji bo sosyalîzmê di eynî warî de, di destpêkê de, gelek kurdan digire hemberî xwe. Di vê rewşê de kurdên oldar û misilman çima di nav vê tîkoşînê de cih bigirin? Ma sedema ku ne di nav de ne jî, ne ev e? Yên ku li xayînen kurdan tenê di nav sistema cerdevaniyê de digerin, bi min xelet in. Ezil xayînen kurd; ew kes in ku dixwazin, dîne wî, baweriya wî, orf û adetên wî bi zorê biguherînin.

Ez ji van re dibêjim "jakobenê kurdan" an jî "kemalistên kurdan". Ez yeqîn nakim ku tu pêwistiya kurdan bi "kemalistên kurdan" heye.

Tevgera kurd divê ne tevgerêke îdeolojîk be, divê eniyêke dorfireh û demokratîk be. Divê hemû mirov di nav vê tevgerê de nasnameya xwe bibînin, lê hema divê tu kes nasnameyekê, bi yên din nede qebûl kirin. Divê hemanên vê tevgerê ne sosyalîzm û laîkperestî be. Divê gelê kurd terciha xwe bi awayekî vekirî deynin holê. Bi dîtina min gelê kurd terciha xwe diyar kiriye.


Gelê kurd li herêmê, partiyêke siyasî ya ku dîn derxistiyê pêş û partiyêke ku nasnameya wî ya etnîk derxistiyê pêş, peji-randiye. Bi vî awayî rengê xwe û daxwaza xwe bi şeklekî eşkere daniye holê.

Em êdî dibin xwediyê zimanekî nûjen. Zimanê ku di televîzyona MED'ê de tê bikaranîn zimanê ku pê dengûbas tene xwendin her çiqas niha ji me dûr e û em pîrî caran tînahîjîjî jî, dîsa dikeve nava civakê. Ziman tesîra xwe dide ser hemû civatê, ji hêla teknîkî, ji hêla olî, ji hêla çapemenî ve, bi kurtasî tesîra wê li ser hemû warên jîyanê heye. Evîna du kesan jî, beşek jîyana civakê ye. Lewre bere bere zimanê evînê, evîndariyê jî wê biguhere. Yanî mirovek dema ji evîndara xwe re nameyekê bişîne, divê êdî bi zimanê dengûbasan bişîne. Wek mînakê vê yekê ez dixwazim nameya ku Samet ji dildara xwe re re nivîsiye pêkkêşî we bikim. Samet ciwanekî ji Kurdistanê ye, Melehat evîndara Samet e, bavê Melehatê ji Samet hez nake. Ji ber ku Samet bê kar e, bê mal e û ne dewlemend e. Melahat jî bê qerar e, gelo ji Samet hez dike, an na? Yanî welhasil sebra Samet hatiye qirîkê, êdî lazîm e ku Samet nameyeke dawîn bişîne ji Melehatê re. Bavê Melehatê Evdilkadir Beg, mirovekî ne pîr welatparêz e. Samet nameya xwe bi zimanê nûjen yanî zimanê dengûbasan dinivîsiye ku tesîrê bide ser Evdilkadir Beg. Belê Samet kaxiz û pênuşê digire destê xwe û dest bi nivîsandinê dike; bi zimanê fermî: "Evîndara min a birêz Melehat. Rewşa min ji aliyê aborî ve baş nîn e. Ji ber ku min ji bav û kalan bingehek bi dest nexistiye. Rewşa min her çiqas ev

Evîna fermî

e jî, divê em bi we re hevdişînekê çêbikin. Ezê vê duşemê nûnerê xwe bişînim, bila bi wezîrê karê hundirê yê mala we re hevdişînekê çêbike. Belkî em pîrsîrêkên xwe ji hêla siyasî ve çare-

çavan ji Ozan Xanemîr strana "Tew tew gidiyê dîlanê" dixwazim. Evîndara min a birêz ev bû sê sal, ne bavê te ji lîxistina min tîr dibe, ne jî Ozan Xanemîr dev ji strana "Tew tew gidiyê dîlanê"



ser bikin. Tu zanî, ew hevdişîna me ya dawî, ku li me bûbû "hewdişîna" çalakîyeke nebaş bû, apê te Salih du saetan ez dîl girtim. Jixwe beriya wî jî ez ketibûm kemîna xalê te û pîsmamê te. Edaleta Mafên Mirovan, Helsînkî Watch kete navbera me û wan ez berdîm.

Evîndara min a birêz Melehat,
Ez ji bo te her hefte ji programa Ser-

nê" berdîde. Bavê te ji şerawestîne re bersivê nade û wekî hêzên dewletê bi ser min de tî. Lîkolînên ku ez li ser çalakîyên me dikim, bûne sê pirtûk û ezê wan di demeke nêz de bidim weşanxaneyê Dozê.

Birêz Melehat, bawer bike evîna me evîneke navnetewî ye. Programa Nûbiharê li benda me ye. Xoce yê ku her îne

xutba dîni dixwine, bila beriya vê îne mara me bibire. Heke xoce mara me nebire, ezê li dijî wî çend livbazîyan li dar bixim. Evîndara min a birêz, li gorî agahdariyan bavê te daxuyaniyek li çapemeniyê belav kiriye, daye zanîna ku, ewê te bi roketavêjan biparêze. Evîndara min a birêz ez ne êrîşkar im, heke bavê te vê rewşê wisa bidomîne, zehmete ku hûn bikevin Yekîtiya Gumrikê. Yanî heke hûn nekevin Yekîtiya Gumrikê hûnê bibin mehkûmê guhdar kirina strana "Tew tew gidiyê dîlanê". Heke hûn vê yekê nexwazin, çavdêrî yên zanyaran bigirin ber çavan. Û di dawiyê de ji Evdilkadir Beg re bibêje ku ez berendamê zavatiyê me, ez karim bendava ji sedî deh derbas bikim, yanî di nav berendamên zavatiyê de, berendamê herî bi şens ez im. Bawerîya min ew e ku ezê ji sedî sîh û heftê dengan bigrim. Û ezê bi serê xwe bibim zava, ji xwe li gorî erf û edetên me di zavatiyê de koalîsyon nabe, divê yek kes bibe îktidar. Evîndara min a birêz, ez bawer im wê bavê te jî dengê xwe bide min û emê di demeke nêz de, di programa Şox û Şengê de bi şahidiya Cîndo û Rotînda û bi strana "Tew tew gidiyê dîlanê" daweta xwe çêbikin.

Evîndara min a birêz, ez silavê xwe pêşkêşî te dikim û we bi dilekî germ hembêz dikim. Ez bawer im wê di demeke nêz de navê Evdilkadir Beg jî di programa "Navên Nemir" de derbas be. Bimînin dixweşiyê de.

AMED MAHSUM

XELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (7)

XAÇEPIRS

B	E	G	A	V	L	A	L	E	S
R	U	H	R	I	S	A	L	E	
S	I	L	A	N	S	I	H	F	
K	I	B	E	L	E	O	L	E	
Ü	S	E	B	T	I	R	A	Q	
E	T	T	M	A	N				
A	V	A	M	A	N	C			
T	N	A	D	G	A				
T	N	A	D	T	O	R	O	S	

Bersiva Xaçepirsê (5)

Xaçepirs me bixelat e.
Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 7'an kitêba.
Reşîdê Kurd "Ez" e.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

Kesên ku xelata xaçepirs 5'an kasetê Gulên Mezrabotan "Ji dinê re aştî" qezenc kirine: Ronahî Beyazıt/Istîbol, Bülent Uçaman/Diyarbakır, Mustafa Yıldız/Diyarbakır, Zeki Bazıdî/Ağrı, Orhan Çetintaş/Şanlıurfa, Aziz Gürpınar/Diyarbakır, İbrahim Altunışık/Batman, Dilan Candan/Diraybakır, Mirza Yılmaz/Batman, Welat Yavuz/Manisa

Hunermen da kurd (wêne) Ajneber	1	Xwîska bav Pêxemberê Bûdistên Tibetê	Rêncber Rîcat	Gihane kek Navendi	Cih Sembola isewîyan	Çejik
			5		Bandor	
Peyk					Cihê meşê	2
Robar					Bîlez	
			Sorê agir Enstruma nek			Notayek
Şîrove				Gelekî Mezopotm yayê Dîn		
Genim lê di hêrin	6			7		
		Komedi Sewalek (şahêmer)			Paşgîrek	
Şofêr			Pivaneke dirêjahîyê	Gelek, zor		
Xelk, Der û dor				Dayik	Sembola Neonê	
Bawerki rin	4					
Paşgîrek						
			Derman		3	

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7



Tîcey wesarî

Hêdî hêdî wesar yeno Kurdistan. Îktîdarê zimistanî û vewre qedêno, tîce û wesar cay înan gênê. Tîcey wesarî ay rocanê ewilî zehf weş û bi qîmet a. Estanê merdimî ê rocanê serdînan de kena germine. Wexto ena tîcî veciyayne mêrde û extiyaranê dew verê dêsan de, serê banan de xwi dayne verê tîcî û sohbet kerdêne. Qalê karê xwi, problemên dew, zimistan, wesar û tîcî kerdêne. Tûtan zî dewr û verê înan de gozan sero, kapan sero kay kerdêne.

Dewey ma de cayêke bi namey "Vereroc"î bibî. Cay kombiyayîşî û xebirdanî bî. Zey Vererocî cayo weş û germin ê rocanê wesarî de peyda nebîne. Mîlete tiya kom bîne û xwi dayne verê tîcî. Sohbetê weşî tiya bîne. Vereroc qiyameyke de bî, papûre (rey wesarîdan) zî Vereroc ro şîne. Minûbusan û wesarîdê bînan tiya bar û muşterî xwi naynero. Dewe ra hergû roc serê sibay rew di- hîrê minûbusan muşterî xwi girotêne û şîne Diyarbekir û hetê şanî zî bameyne dew.

Rocêke rocanê Homa ra extiyar û camêrdê dew Vereroc de kom bibî û hergû joy qalê çîke kerdêne. Ancî ê rocan de dewican sil antêne miyanê hêgay xwi, hazîrî titûn ramitîşî kerdêne. A roca ku dewicî Vereroc de kom bibî, Şewqî zî bi herê xwi yo siya sil antêne miyanê hêgay xwi.

Şewqî beşinkilm, dewesnaye, siya-belot û xwi ra zehf razî bî. Şewqay xwi

wa siya antêne heta miyanê çîmanê xwi. Verê xwi nêvînayne û bi qey kû verê xwi bivîno serrey xwi zehf kerdêne berz. Destanê xwi zî pey qiney xwi de dayne pêser, hêdî hêdî xwi şaynetê û bi qureti reyra şîne.

A roca kû Şewqî sil antêne miyanê hêgay xwi ancî dimay herê xwi wo siyay û çîway cê destê cê de ço ço kerdêne.

Xalo Mihemed zî Vereroc de niştîbîro, qûti xwi kerdebî a û cixara piştêne. Şewqî hame silam da Xalo Mihemedî, Xalo Mihemedî silamê Şewqî girot û ro cê çarnaa. Cixaray xwi kerdebî miyanê lewanê xwi, visteta, helmêkewo kûr te ra ant û dûman verada teber. Hema cixaray Xalo Mihemedî nêqediyabî Şewqî miyanê hêgay ra, esparê herî geysa a û hame ancî silam da. Xalo Mihemed hema cay xwi de rûniştêbî û silamê Şewqî nêgirot. A rocî Şewqî çende rey şî û hame. Hergû şiyayîş û hamiyayîş de silam dayne. Xalo Mihemed hendi aciz bibî. Şewqî ancî hame zey heme reyanê bînan silamê xwi da la, Xalo Mihemedî silamê cê nêgirot. Şewqî piçêke aciz bî, nepexiya, erdî hewate nêda ci û bi vengê xwi qure va:

-Xalo Mihemed min silam da veng niyame to. Xalo Mihemed hêrs bî û qîra:

-Ena çî teba wa, ti şîne û yenê silam danê, silamê xwi tepiya bigîre û reyna zî silam mede min. Eno çî wo, ti serê sibay ra şîne û yenê silam danê, ez

kewta belay to. To ver rihetî çîniya tûto. Şewqî hîvey enî ciwabî nebî, zehf ver kewt û aciz bî. Verê xwi şa keye û niçe niçe kerdêne. Xwi ra persayne û vatêne: "Ez fam nêkena merdim silam nêdano aciz benê, silam dano ancî aciz benê. Ma go derdanê enî merdimanê anahînan ver serra şîn.

Herê, Şewqî hêgay xwi ra, dewey xwi ra û herê xwi ra hes kerdêne. Rey reyan cî wexto verê dewican ro şîne, qîrayne herê xwi wo siyay ser heger dewicî pê bizanê kû honî yo Şewqî yeno, Şewqî dew de tîpêke wo tîpîk bî.

Zey heme dewanê Kurdistanî, neyarî ena dewa weşê, zey cinetî zî şara û veyşna. Eno wesar go kam xwi Vereroc de bido verê tîcî? Gelo Şewqî enka esto, çîniyo? Heger kê xwi berdo Diyarbekir gelo ewca sekeno? Çiya xwi dano verê tîcî eno wesar?

Bi qey dewicêke dinyay cê, cinetê cê, heme çiyê cê dewey cê wa. enî neyare bê însaf û zalimî دنیا û cinetê ma, dewey ma û welatê ma şara, agir napa û veyşna, la heta kînga?

Senîn tîcey wesarî dana vewre ro, helnêla, goşt û estanê merdimî kena germine û îktîdar zimistanî ra gêna, go gerîlayê ma zî eno wesarde bidê neyarê ma, wo zalimî ro û heyfê. Şewqî dewicanê Kurdistanî û ê ma hemina bigîrê. Bi hîvey ê rocanê weşan û tîcey wesarî.

ROBÎN REWŞEN

WELAT

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Kürtçe Gazete)

Li ser navê ZERYA Basın ve Yayıncılık San.Tic.Ltd.Şti. (adına), Xwedî (sahibi): CELALETTİN YÖYLER

Gerînendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni): MEHMET GEMSİZ
Heyeta Weşanê (Yayın Kurulu): SAMÎ TAN, AYNUR BOZKURT, RAHMÎ BATUR
Berpîrsê Karê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü): DÜZGÜN DENİZ
Berpîrsê Saziyê (Müessese Müdürü): TAHİR ELDEMİR

Navnîşan (Adres): Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu-İstanbul
Tel-Fax: 0 - 212 - 293 53 19
Çapxane: Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım A.Ş (BBD)

Agirê şoreşê jin pêdixin



Ken Loach

Bi rastî jî jiyana gerîla, jiyanekê pir dijwar e. Gerîlayên wekî Rosîta, Rosa, Ameliyayê ne tenê li Nîkaragua, Îspanya û Îrlandayê jî hene. Ez, ji jiyana wan re hurmetê nîşan didim. Ew dilên tevgerê ne, şoreş bi wan geş dibin û bi rastî jî ew agirê şoreşan pêdixin.

Berî çend mehan li Tirkîyeyê filmek bi navê "Land and freedom" (Welat û Azadî), di sînemayan de hat nîşandan.

Film, li ser şerê hundirîn yê Îspanyayê bû. Rejîsorê wî filmî Ken Loach, bi çêkirina filmên li ser şerên gelên bindest, jiyana sivîlan û kesên ku di van şeran de cih girtine û rola wan, nav û deng daye. Ken Loach îcar li ser gerîlayên Nîkaraguayê ango Sandînîstan film çêkiriye. Ev film jî bilî şoreşa Sandînîstan, jiyana gerîlayên jin û di nav tevgerê de rola wan jî xwe re kiriye mijar.

Ken Loach, filmê bi navê "Carla's Song" (Strana Carla), li bajarê Managuaya Nîkaraguayê kişandîye. Ev bajar warê şoreşa Sandînîstan e. Hê jî-şop û rêça şer, li ser dîwarên xwe dide xuyan, ew jî taybetiya filmê zêdetir dike.

Lehengê sereke yê film parêzerekî (ebûqatekî) Îskoçî ye. Ew parêzer, Paul Laverty di salên 1978 û 1979'an de ji bo ku mafên mirovên wê derê biparêze, çûye Nîkaraguayê. Laverty li wir, derbarê jiyana gel û gerîlayên Sandînîst de senaryoyek nivîsiye. Wî 5 salên xwe

dane nivîsandina wê senaryoyê û Laverty piştî li filmên Ken Loach temaşê kiriye, wişa baweriya xwe pê aniye ku li rûyê dinyayê, ji bilî wî, kes nikare filmê wê senaryoyê bikişîne.

Li gorî senaryoyê, şofêrekî otobusê gerîlayekê jin dinase û ji nişka ve xwe di nav şoreşa Sandînîstan de dibîne.

Ken Loach dîtînen xwe yê li ser senaryoyê wiha fîne ziman: "Ji aliyê çêkirinê ve gelek diwariyên kişîna filmekî bi vî rengî hebûn. Senaryo pir tevlihev û giran bû. Ji aliyê listikvanan ve bigire, ta bi cihê ku wê lê film bihata çêkirin, pir diwarî hebûn. Daxwaza min a ji bo kişîna filmekî bi vî şeweyî, ev hemû diwarî têk birin."

Listikvanên film jî, ji nav kesên ku rasterast di nava şoreşê de cih girtine, hatine hilbijartin. Şofêrekî ku li bajarê Glasgowe (Robert Carlyey) yê ku bi çavên xwe rastiya şoreşê dîtiye û Carla Songs, a ku ji nav komîteya Sandînîstan ya Maraguayê bûye, hatine neqandin. Ev jî nîşan dide ku film çiqas realist e û gerîlayên jin çawa agirê şoreşê pêxistine.

Carla Songs a ku piştî destpêka şore-



Dîmenek ji film

şê, tevî gerîlayan dibe û di nava komîteya Sandînîstan de cih digire, tevî şerên giran dibe û li bajaran livbaziyan dike. Dema ku jê tê pirsîn "Ji jinekê re ev bar giran nebû?" wiha bersiv dide: "Ger hûn dixwazin armança şoreşa me hûn bibin, pir basît e, yê ku herî zehf jan dikişandin em bûn."

Ken Loach jî, li ser jiyana gerîlatiyê û jinên gerîla wiha dibêje: "Bi rastî jî jiyana gerîla, jiyanekê pir dijwar e. Gerîlayên wekî Rosîta, Rosa, Ameliyayê ne tenê li Nîkaragua, Îspanya û Îrlandayê jî hene. Ez, ji jiyana wan re hurmetê nîşan didim. Ew dilên tevgerê ne, şoreş bi wan geş dibin û bi rastî jî ew agirê şoreşan pêdixin."

Ev film hîna nehatiye Tirkîyeyê.

Kesên ku bixwaze jiyana jinên gerîla û jiyana xwe bibîne, pêwîste dema ev film were Tirkîyeyê li vî filmî temaşê bike.

Piştî çend salan, baweriya min ev e ku gerîlayên jin ên kurd jî wê bibîne sembolên filman, wekî ku çawa Carla Songs dibêje: "Yên ku di şoreşê de herî jan dikişandin em bûn."

Li Kurdistanê jî, bi sedan sal êşên ku civak û hêzên dagirker bi jinên kurd dane kişandin diyar e. Lewre ew jî, ji ber van û ji ber azadîxwazbûna xwe bûne gerîla. Hem jî ne bi hejmareke hindik; ku ev beşdarîbûna wan a şoreşê bala gelek kesan dikişîne.

METİN AKSOY



Gerîlayekê jin